Konê Reş

# ŞIHINA ŞEVBUHÊRKÊN DIL



ŞÎHÎNA ŞEVBUHÊRKÊN DÎL

**Konê Reş**

- Navê pirtûkê dîwanê: Şîhîna Şevbuhêrkên Dîl
- Navê Helbestvan : Konê Reş
- Derhênana hunerî : Mihemed Mela Hemdî
- Hijmara Sipardinê: (2184 ) sala 2010
- weşana hijmar: 199
- Çapxana : Hawar – Duhok

ji weşanên Êketiya Nivîserên Kurd-Duhok

199

**Konê Reş**

# ŞÎHÎNA ŞEVBUHÊRK ÊN DÎL

Kurdistan 2010

# Diyarî

Bi helkeftina ku 100 sal li ser zayina helbestvanê navdar (Cegerxwîn) re derbas bû. Ew ê ku di rewşeke zor çetîn û dijwar de, mîna xelekekê bû di nabvera kevin û nûyê me de, bi deyax, berxwedan û pêdariya wî, kevin û nûyê me ji hev cuda ne bûn û hatin parastin ...

Bi vê helkeftinê, ez şîhîna van şevbuhêrkên dîl, dikim çira û li ber serê wî vêdixim û wek diyarî ji giyanê wî yê dilovan û mehreban re pêşkêş dikim.

Diyarî ji wan kesan re, ewên ku peyva Kurdî diparêzin, nav di hilgirên pênûsa Kurdî de didin û herdiwan bi hev re di nav pelan de kom dikin.

Konê Reş
Qamişlo

# Ez delaliyên xwe li kê bikim?!

(1)

Carna çiyayê Bagokê û
Çiyayê Omeryan
Li ber çavê min dibin
Mîna gelî û newalên kûr
Deşta Mêrdînê û Beriya Xelef Axa
Dibin wek;
Çiyayê Ararat û Cûdî
Nêrgizên buharî,
Di mêrgan de
Çilmisî xuya dikin
Kuç û latên quntarên çiya
Li ber çavê min dibin;
Mîna siwaran,
Haya, haya wa ye...

Kêm caran,
Ez bi huş xwe ve
Têm..!!
Heger hûn zanin
Ew  kîjan car in?!
Ew car
Dema ko ji neçarî

Hêsir ji çavê min
Têne  xuarê
Dema ko,
Mejî, hest û derûn
Bi hev re kar dikin..
Dema ko ez dixwazim;
Avaniyekê ji mirovantiyê re
Ava bikim,
Gul û kulîlkên rengîn û bi bîn
Di beyaran de bi çînim,
Helbestan ji zarokan re bibêjim û
Taqeta min negihêje,
Ew delîve li ber min
Girtî be û
Rê li ber min
Winda be..
Hingê çendî ez dixwazim;
Vegerim zarok û têr bigirîm.
Vegerim zarok,
Da ko bê şerm û fedî
Bigirîm.
Hingê tu kes nabêje min;
Çima tu digirî ?!
Çima tu digirî ?!

(2)

Mêzeke ..xweş mêzeke!

Dîsa ezê vegerim û bibêjim;
Carna dibînim ku
Çem beovajî
Di herikin
Hesp li ser guh û teriya xwe
Di bezin,
Avanî li ser rexekî mane sekinî
Sikak û kolan di bin erdê de
Dirêj dibin,
Şev bûye roj,roj bûye şev û
Kes napirse;
Ev çi rewşe?!
Kes napirse;
Çima mirov paşûpê
Di meşin?!
Çima rok ji rojava
Dertê?!
Ax...Ax...
Nizanim;
Nêrgizan ji kê re bi çînim?
Çawa ji zarokan re
Bistirêm,
Bê ku dengê min bi fetise..!!

Dengê hay haya
Siwarên deşta Mêrdînê û
Beriya Xelef Axa
Nayê guhê min..

Vêca ezê çawa
Ji zarokan re bistirêm ?!
Bi siwaran re bikim
Hay  Hay  û
Her birînek di laşê min de
Helbesteke,
Her helbestek hawareke..
Di be ku ez tev hawar bim!
Vêca bihêlin;
Ez gilî û gazinên xwe bikim
Hundirê xwe ji kul û xeman
Vala bikim
Her kes delaliyên xwe li min dike!
Ez delaliyên xwe li kê bikim ?!
Erê, ez delaliyên xwe li kê bikim
Li kê bikim.

# Şivan im

Şivan im !
Û kes bi min
Nizan e.
Ji bebanga sibê ve
Ta bi nîvê şevê
Şivantiya zarokên xwe
Dikim,
Yê ketî hewil didim
Wî rakim
Yê ji rê derketî
Hewil didim wî li rê
Vegerînim...
Şivantiya wan dikim ku
Têr razêm...!
Lê mixabin!
Hay û bayê kesî
Ji min nîn e..
Nizanin ku ez û xew
Raserî hev dimînin,
Ez zêrevaniya şevê dikim
Şev zêrevaniya min dike û
Hay û bayê
Kesî ji me nîn e...
Şivan im!

Col û keriyên xwe
Ji keleş û dizan
Di parêz im
Şivanekî nenas û
Bê deng im.
Lê di zêrevaniya xwe de
Xweş şivan im
Di çêrandina sewal û
Tarişê xwe de
Baş melevan im..

Şivanekî bi soz û
Wijdan im;
Kavir li dor min
Di civin,
Berx li min di banin..
Ez jî,
Xwe ji wan re dikim êm û
Rêsiyê giyan e
Wan di parêzim û
Qet nahêlim
Ji keriyên xwe bêne berdan e..

Şivan im !
Piştî çêrê,
Keriyê xwe
Di mexel de
Di civîn im

Li dor di zîvirim
Wî ji gur û hirçan
Bi dûr di xînim
Di bêhinvedan û
Rawestandina xwe de
Xwe di nav kul û xeman de
Di bînim û
Sed heyf û mixabin
Hay û bayê
Kesî ji  min nîne
          Ji min nîne..

# Ew û Doda û Bîranîn

Di wê bîstikê de
Doda hatibû bîra wî
Ew kêlîka ku
Ji bîr çûbû û
Di xwîna wî de
Hatibû veşartin.
Li wan kêlîka vegerya bû û
Di gerya...
Di gera xwe de
Xeyalan ew dûr dibir,
Ew li kaxetên kevin
Vedigerand..
Di nav wan kaxetan de
Pêrgî gelek tiştên
Kevin û nû di hat:
Dêmê gundiyan
Yên sax û mirî..
Hin pêre di girnijîn û
Di kenyan,
Hin dêm tirş û
Bi xemgîn û mitale bûn...

Di wê bîstikê de
Di ponijandinek kûr û
Bê deng de
Mîna pûtekî sar û cemidî
Mabû girêdayî
Mirov ne dizanî
Gelo ew bi rih û cane
An mirovekî bê giyane
An xewn û xeyalan ew
Di wê kêlîkê de vedizîye û
Dûr dûr ew biriye
Û bi tenê DODA di bîra wî de
Hiştiye..?
Ew gundê ku ji biçûkanî ve
Hogirî wê bûye...
Na.. Na
Ne ew di xewnan de bû
Û ne di xeyalan de bû
Bi tenê ew bi  bîranînên xwe re
Mijûl bibû,
Wî bîranînên xwe
Di wê bîstikê de
Yeko yeko
Bi darvedikirin
Di nav roj,meh û salan de
Derbas dikirin...
Di wê kêlîkê de
Ew û Doda û bîranîn

Bibûn mîna tabloyekî neqişandî;
Ji rengê kolkezêrîn û
Ji wan rengan
Ev helbest herikiye

# Normal e

-1-

Normal e
Gul, kulîlk û çîçek
Di buharê de
Bikenin.
Berf û baran
Di zifistanî de
Bibarin.
Normal e...
Çiya bilind bin,
Gelî kûr bin,
Çûk û çivîk li esmana
Bifirin...
Normal e...
İsmaîl ê dîn
Dostê min be,
Xelef ê dîn
Bi dûv min de
Bibez e,
Semîr ê dîn
Bi dûv şopa min de
Biger e...
Normal e...

Ez gul û kulîlkan
Bidêrim,
Hin xurêl û zîwanê
Bêjing bikim,
Ez ji zarokan re
Bistirêm,
Xerab zarokan
Bigirînin.
Ez avaniya ava bikim
Ew daniştiyên wan avaniyan
Di çala kul û xeman de
Werkin.
Normal e...
Normalî
Di navbera
Şîn û şadiyê de,
Xêr û şer de,
Reş û sipî de
Li ber xwe dide.
Normalî;
Ev kêlîka
Tu vê helbestê
Dixwînî û
His û hestê te
Tije dike,
Geh tu dibêjî:
Waye,
Rast û duriste,

Geh tu dibî dudilî û
Dibêjî:
Xewne,
Xeyal û fantaziye,
Kesî bi dewla normaliyê
Av ji zarkên xwe re
Ne aniye.
Heyamê me,
Heyamê «Beleko bi lepê xweyo»
Kê xap li kê kir
Pêre çûye seriye,
Normalî çiye..?!
Ne normalî çiye..?!
Tiştekî normal e ku,
Weha galgal bêne gotin,
İsmaîlo dîn bibe ?!
Xelefo bibe hotir !
Newafo tiredîn be ! û
‟Kevirên caran
Bixindirin binê newalan,
Kevirên newalan
Hilkişin serê caran…!”
Di vî heyamî de,
Her tişt normal e...

-2-

Normal e...

Rojnameya “Kurdistan”
Bê Kurdistan
Li Qahîra bê weşandin !
Kovara (Jîn)
Bê jiyan
Li Stenbolê bê çapkirin !
Kovara (Hawar)
Bê ku kes di hawara wê de bê
Li Şamê bê belavkirin ! û
Ev gotinên Mîr Celadet Bedir Xan
Li ber ba bêne dêran:
(Hawar dengê zanînê ye
Zanîn xwenasîn e,
Xwenasîn ji me re riya felat û
Xweşiyê vedike..)
Normal e..!
Pelên kovara (Nûdem)
Li Ewrupa zer bibin û
Birizin..!
Qasimlo û Şerefkindî
Di surgûniyê de bêne kuştin..!
Selîm Berekat
Bi zimanê biyaniyan
Bike hawar û gazî..!
Partiyên me
Ji hev bizên,
Ji yekê bibin sêzdeh û hinek..!
Şerê hev bikin

Li ser ku,
“hêk ji mirîşkê ye, an mirîşk ji hêkê ye”
û zimanê kurdî di ser guhê xwe re
Bavêjin !
Normal e..!
(Gurî bibe Axa) !
Idrîsê Bedlîsî
Bibe gunehkar !
Melayê Cizîrî
Bibe tolaz !
Mîr Bedir Xan û Mîrê Rewandûzê
Bibin xayin !
Nicmo û Melayê Xatê
Bibin welatperwer !
Normal e…!
Normal e…!
Normalî, di zikê normaliyê de
Bidarve dibe û
Di sînga dem û dîrokê de
Tê daleqandin..!
Her ku bahozek radibe
Dengekî kûr û dûr
Ji zengilê normaliyê dertê:
Ezim dengê rastiyê,
Çendî hûn xwe veşêrin
Ez rastî me,
Çendî dem derbas be

Ez berz û eşkere dibim,
Hûnê ji ber min ve
Bi kûve birevin ?!
Bi kûve herin ?!

# De werin !

De werin, de werin…!
(Vî kerî,
Di vî buhirî re derbaskin)
Camêra
Ji necamêra naskin…
Haware, hawar;
Balafir,
Çûk û çivîk
Bi baskin, bi baskin
Çendî çiya biçûk be
Navê wî çiya ye
Çendî bergîl gir be
Bi hevsar û rişme ye
Li ser bênderan girêda ye..
Çendî bîr miçiqî be
Bêhna avê li dor xuya ye

De werin, de werin
Êmê ker
Bûye gul û kulîlkên ter!
Dibêjin;
Simaîlo dîne
Hawar tirole ye

Xelefo bûye leşker..
Ma raste;
Nêrgiz payîzî ne?!
Zebeş buharî ne?!
Û tirî êmîşekî zivistanî ye?!
Ji mêj ve pêşiyên me gotine:
“Kesê ne kes be nabe kes,
kurtanê kerê nabe etles”
Roja îro ne tenê
Kurtanê kerê bûye etles!
Belê kevirên newala
Çûne serê cara
Û kevirên cara hatine binê newala

De werin, de werin!
Kihêl bê cuherin
Pir hesp bê siwarin
Siwar peyane
Comerd xizanin
Çikûz maldarin
Leheng girêdayî ne
Newêrek û bizdok
Bi serbestî û bê tirs
Diçêrin, çilvîtka didin..
Û wefadarî bûye hotirî
Qey eve qedera dinyê
Dinya wilo hatiye
Û wê wilo here

De werin, de werin!
Vî kerî
Di vî buhirî re derbaskin…

# Jiyan Rewrewka Derewîne

Di nav rewrewk û leylanê de
Dilîzim !
Wek tûmê kelemperê
Li ber bê di gindirim !
Ne jiyan mafê min î
Xweristî dide min
Ne ez ji dûv xwestek û daxwazên xwe
Vedigerim !
Ne ew dihêle ez têr razêm
Ne ez dihêlim şeva wê bi aramî û
Bêdengî derbas bibe !
Ji çar hawêr ve rewrewke
Rewrewkek mîna selefê siwaran,
Di asoyê zemîn de xuya dike…
Keskesorek bê tave
Buharek bê kulîlke
Zivistanek bê berf û barane
Ew jî mîna pêlên rewrewka derewîn
Mîna pêlên deryayê
Li bin guhê hev dikeve…
Erê jiyana me
Mîna rewrewka derewîne

Qûnaxên wê
Mîna pêlên deryayê ne
Tu kesî ew negirtiye û
Kes negihiştiye dawiyê…

Jiyan, rewrewk û pêl
Mîna hevin
Digel hev şer dikin,
Di nav wan de cenge
Erê cenge!
Qûnaxên wê
Mîna pêlên rewrewk û deryayê
Bê şûn û şope, bê bîn û hilme
Bê reng û kesme
Bê ser û bere
Mîna rewrewka derewîn û
Pêlên xapînok
Bê cih, war, hêz û hebûn e
Erê jiyana me
Rewrewka derewîne.

# Çend wêne

-1-

Bahozê ji rewrewkê re got:
- Bi dûrkeve, xwe bide alî,
Te xelk bizdandin bi dîtina wan
Pêlên derewîn.
Rewrewkê lê vegerand:
- Ta ko sitemkarên wek te hebin,
Wê xapînokên wek min jî hebin
De ka emê herdu xwe nema bikin?!

-2-

Dara Hinarê gazî dara Zeytûnê kir:
- Wa dara Zeytûnê !
çima tu jî xwe wek min tazî û rût nakî?
Dara Zeytûnê lê vegerand:
- Heger te zanîba bê çendî tu kirêt û
megrûdî ye, te jî xwe tazî ne dikir...

-3-

Qenco ji neqenco pirsî:
- Pepûko! çi te daye pey qenciyê û zarokên te têr nan naxwin!
De hela tu jî weke min bike,
Tê bibîne bê çawa rewşa te xweş dibe..
Qenco lê vegerand:
- Ji ber yên weke min, yên weke te hene
Zarokên te para zarokên min dixwin
Ezê weke xwe bimînim tu wek xwe bimîne
Mane Kurdan ji mêj ve gotine:
"Qenc kiro bi xwe kiro, xerab kirio bi xwe kiro"

-4-

Yê bê şerm û fedî gazî birayê xwe
Yê bi şerm û fedî kir:
-çima tu wisa bi kul, xem û êşî?
Birayê wî lê vegerand:
Heger bêvla te bi şewitya
Bê gûman tê jî weke min bi kul û keser ba..

# Normalî û ne normalî

**- 1 -**

Normale ko di zivistanî de
Dara Hinarê û mêwa tiryê di hewşa min de
Xwe tazî û rût bikin
Bê ko şerm û fedî û rêzgirtinê
Ji xuşka xwe dara Zeytûnê re bigrin
Normale, qaz û quling
Bi hatina berf û baranê
Dilşad û geş bin,
Zerzûr û beraşe
Ji ber sira bayê berfê û
Tavên baranê
Di qulên xwe de qefilî û dîl bin.

**- 2 -**

Ne normale
Ko di zivistanî de
Cilkên feqîr û xizanan şilo pilo bin
Tifikê wan ji bê agirî
Bê dû û temirî bin..

Dewlemend û maldar
Bi ziktilêrî
Li ser xalîçeyên Tebrîzî,
Li ber şofacên Frencî
Raketî bin…
Şerm, fedî û rêzgirtina wan
ji mirovatiyê re nîn be û
Hay û bayê wan ji guhertinên salê
Qet tu nîn be…
Normalî û nenormalî,
Erênî û neyênî,
Reş û sipî,
Avakirin û wêranî
Her dem û gav raserî hevin
Xwendevano!
Bêje min tu bi kêreye
xwe eşkere bike…

# Te divê bixwînî an nexwînî

Welatiyê min ..!
Da ku tu
Bi herdû çavên xwe
Yên mîna
Gola Wan û Ormiyê
Van helbestan bixwînî,
Bi dengekî bilind
Mîna bilindbûna
Çiyayê xwe
Bistirînî û
Sînga te tijî his û hest
Bibî...
Min ev helbestên xwe
Ji bo te nivîsandine...

Ev helbestên ku
Di sînga tu welatiyî de
Nayêne parastin
Ji sînga te welatiyî
Pêve..
Ji ber ku;

Bi serketin û şahiyên te re
Ez kêfxweş û dilşadim,
Bi kul û xemên te re
Ez xemgîn û bi mitaleme..
Vêca tu bi kêfa xwe ye:
Te divê bixwînî, an nexwînî..?!
Kêfxweş bî an xemgîn bî..?!
Bi nivîsandina van helbestan re
Ez xwe rehet dikim...

# Gula Hîroyê

1

Heger kevok;
Ji teyrikên
 Aşitiyê bin,
Dar zeytûn;
Ji darên
Aramî û tenahiyê
Bin,
Gula Hîroyê
Bi rengê xwe ve
Sembola hezkirin,
Xêr û hêviya ye

2

Çendî,
Min rengê êş, jan û
Birînan dîtibe
Min reng weke
Rengên gula Hîroyê
Vajî hev

ne dîtine...

3

Gula dilê min
Mîna gula Hîroyê
Pir bi rebge
Heger gula Hîroyê
Bi rengê kolkezêrîn
Hatibe xemilandin
Gula dilê min
Bi êş, jan û birînan
Rengîn bûye..

# Giriyê du reng

Hingê digiriyam û
Hey digiriyam
Rondik ji çavê min
Mîna zîpikên buharî
Dihatin xwarê.
Dengê giriyê min,
Li çar hawêr
Belav dibû..
Dê û bav,
Xuşk û bira
Nefret li giriyê min
Di barndin.
Ta bi cîran û gundiyan jî,
Bê dilî û
Ne razîbûna xwe
Ji giriyê min
Diyar dikirin..
Çima ez digiriyam,
Min çi dixwest..?
Kesî nizanî bû..!
Ji ber ku,
Ziman nedigerya

Va îro
Ez mezin bûme,
Serwextî fen, xap û
Danûstandinên civatê me.
Û bi şêweyekî nû
Digirîm,
Giriyekê bê his û deng
Dikim û
Tevî vî bêdengiyê
Min sînorên herêma xwe
Derbas kirine û
Dengê vî giriyê minî nû
Di welatê min de
Li hev vedigere...
Û hin caran
Dengê vî giriyê minî
Bê his û pêjin,
Hêsrên minî
şor, tirş û tal,
Xwe digihînin
welatên cîranan.
Vê carê
Rondikên giriyê minî
Bê deng,
Mîna dilopên ava reşin..!
Bi van dilopên avreş
Giwîzikên pemboyê spî
Belekdikim, dineqişînim û

Mîna pûtekî
Bê his û pêjin
Li kêleka kavlên (Birca Belek),
Di nav peravê
Ava Dicle de
Xuya dikim û
Bi vî giriyî re
Xelkê cîhanê
Bi rewşa welatiyên xwe
şiyar dikim,
Dost û hevalan,
Dijmin û neyaran
Serwextî kul, êş û
Azarên welat û wlatiyên xwe
Dikim.
Erê..
Gelek caran,
Ji ber vî giriyê minî
 bê deng,
Serê min êşya ye,
Sergêjek li min geryaye û
Xew ji çavên min
Firya ye.

Berê min zanî bû ku,
Girî, giriyê pîreka ye,
Şerme ku zilam bigirîn.
Bi tenê min zanîbû ku,

Zilamên birîndar,
Zilamên bi kul û keser
Guh li Şermiyê nakin û
Digirîn...
Weha...
Ta ku kul, birîn û xeman
Ez di nav pencên xwe de
Birim û anîm û
Ez hişyar kirim.
Wek ku hûn dibînin
Va ez digirîm...digirîm

Heger giriyê minî bi deng
Di zaroktiyê de
Ji ber pêdeviyên xwarin û
Vexwarinê bû,
Roja îro,
Giriyê minî bê deng,
Ji ber pêdeviyên
Jiyanê ye.
Bi vî giriyê nû,
Ez doza mafê jiyana xwe,
Ya rojane dikim.
Doza wan tiştê xwe
Yên wendayî dikim.
Û her û her,
Ezê bi dûv mafê xwe
Yê xweristî de, bi bezim,

Bi gerim û
Vî giriyê bê deng
Bikim.
Erê ev giriyê bê deng.

# DARA BERIWÊ

Dara Beriwê!
Nizanim çilo ta niha
Tu berz û payebilind
Li ser çiyayên min
Rawestyaye..?
Çawa tu dihêlî
Çûk û çivîk
Liser şaxik û
Di nav pelên te de
Stranan bibêjin û
Govendan bi gerînin..?
Ma ji xaka ku tu
Li ser şînhatiye
Şerm û fedî nakî..?
Xaka ku mirovên wê
Di nav kovan û birînan de
Mane pêçayî..!
Dara Beriwê..!
Duriste; Tu xwe bitewîne,
Rêzgirtin ji xelkên wê re
Pêwîste; Tu xwe xûz bike
Beşdarî bi welatiyên wê re
Da ku çûk û çivîk jî,

Bi welatiyên vê xakê re
Sirûdên şîniyê bibêjin
Erê sirûdên şîniy.

# DÎMENEKÎ SPEHÎ

Gulîstanê..!
Çime tu wisa
Dêmguherî û westyayî
Xuya ye ?!
Hilm û bîna, kul û xeman
Ji rûniştina te di fûre,
Her çar alya ye ?
Di awirên çavên te de
Pêrgî,êş û janên giran
Di bim..!
Dema tu serê xwe
Ber bi jêr nixûm dikî,
Kûr di ponijî bi mitalekî
Hingê;
Hizir û raman
Di serê min de
Di çin û tên
Li tayekî,
Mîna pêlên rewrewka derewîn
Li bayekî û
Êdî nema dibînim
Tiştekî,

Ji bil dîmenê spehîbûna te
Gulîstanê
Heger tu bawer bikî
An bawer nekî...

# DEMA

Dema,
Tîrêjên kul û xeman
Dibin mêvanên min,
Min birîndar dikin
Êş û jan bi hev re
Li min dibin yek û
Hin bi hin,
Kêf û şahiya min
Tê guhertin û
Di çilmise..
Hingê;
Ji neçarî
Ez vê stranê ji xwe re
Di nehirînim:
(Ez bûme pîrê xemcivîn
Bê his û mest û jêr nivîn
Li dil vebûne sed birîn)

# Çend Kurtepistên Haykoyî*

-1-

Deşt
Bi dûz û firehbûna xwe
Diyare.
Çiya
Bi kûp, zinar û bilindbûna xwe
Xuya ye.
Mirov
Bi evîn, dilovanî û mirovantiya xwe
Mirove.

-2-

Ne giringe;
Çendî ez ji we re,
Bibêjim û bibilînim..

Hûn ji min re;
Şor û gotinên
Şêrîn birijînin..
Ya giring;
Berdewamiya
Çakiyê bimîne..

-3-

Çemekî birçî me
Di êmîşistaneke bê ber de
Di buhirim.

-4-

Bela ez bi tena xwe
Di nav kul û xeman de
Vegizandîbim û
Kesî din
Bi min re
Ne beşdar be...

# Zor-Zore

Çaxê birûsk û beledî
Di ser koxika min re
Dilîzîn;
Tirs û wêrekbûna min
Tevlî hev dibe,
Dibim mîna
Rêwiyekî windayî..
Hingê;
Dem destê xwe datîne
Ser her tiştê min,
Hewil dide ku min,
Li ber dergehê zindan û
Ronahiyê biçîne,
Di navbera azadî û
Dîliyê de daliqîne
Û dawî min wek;
Guleyekê ji goga xwe
Bavêje...

Bîr nabe ku,
Ez bi reşewran
Dagirtîme..
Bi dengê Şalûl û Bilbilan

Kêfxweş û şadî me,
Tiyê strana:
(Bavê Seyro û Derwêşê Evdî) me
Zore-zore karibe
Koxika ku min
Di dilê welatê xwe de
Avakiriye
Bi hêsanî
Bi herifînae û
Min di nav pêlên rewrewk û
Leylana derewîn de
Bi gindirîne,
Zor-zore, zor-zore.

# Bendewarî

Gelo!
Hûn dizanin;
Çima şadî di rêde wenda dibe !
Navnîşanên ku ji mêj ve
Me di kolan û çardiryanan de
Danîne rastin,
Xetîr vêketîne
Derî û pencere
Vekirîne
Cil û bergên nû
Li me ne û
Baş box û beran
Hatine serjêkirin...?!
Mixabin!
Çavê me qerimî û
Şadî ne hat ?!
Ne me ew ji bîrkir  û
Ne ew winda dibe û
Weha em di welatê xwe de
Di nav êş,jan û şîniyê
Bindest, dîl û sirgûnkirî
Bendewar û çavnêrê

Şadiyê ne...

Her ku deriyek vedibe,
Em dibêjin; belkî şadî
Têre derbas bibe !
Her ku mûmek
Vêdikeve
Em bi hêvî dibin ku
Li ber ronahiya wê
Şadiyê bibînin...
Lê mixabin !
Ta roja îro
Me ew şadî
Nadîtiye...
Û hêj 40 melyon mirov
Çavnêriya wê dikin,
Bi hêvîne ku
Bi zimanê bav û kalên xwe
Bi kenin û bi girîn,
Bê tirs çîroka (Memê Alan,
Siyabend û Xecê û Derwêşê Evdî)
Ji zarokên xwe re bibêjin û
Wek neteweki azad
Xwe di nav civata miletan de
Bibînin..Erê xwe bibînin.

# Sermelekê Pêşmergeyan

(Ji bîranîna sed saliya zayîna pêşewayê Gelê Kurd BARZANÎ yê nemir re diyarî)

**(1)**

Bazo..!

Di bîranîna sed saliya te de

Pêlên evîna şop û şûna te

Bêrîkirina nav û dengê te

Serborî û rêbaza te

Li ber çavê me

Diraqisin û semayê dikin

Di guhê me de

Bi zingezing û

Bîr û baweriyên me

Di bin navê te de

Di bin yek...

Ey amadeyê

Di nav me de

Mîna rokê...!

Ey dara beriwa.

Dara bi hêl û hêz..!

Va em di bin siya navê te de

Xwe di parêzin.

Ji berê te

Xweş fêkî û êmîşî

Dixwin û bi navê te

Xwe paye dikin û

Pê sûnd dixwin

**(2)**

Bazo..!

Di sed saliya zayîna te de

Welat di kene..!

Gulîstan û daristanên wê

Bi ava (Êlûnê)

Têne avdan

Qesir û qunaxên wê

Bi lat û zinarên

Derbendîxan, Zozik, Soran û

Baziyan bilind dibin

Navê Xanî û Bedirxan,

Hefîd û Goran

Bi tîpên zêrîn

Di sînga welat de têne nivîsandin

Welatîno werin, tev werin..!

Em bi hevre serboriya BARZANÎ

Bixwînin;

Ji Barzana berxwedanê, Mehabada xwînlî,

Peravê Aras, Şoreşa Êlûnê,

11ê Azarê û ta bi

Gulana  rengîn

**(3)**

Wî, wî..

Bi tena xwe dît û

Her tişt naskir

Naskir ko;

(Da ko mirov kurdekî dilsoz û resen be,

ew hunerek zor çetîn û dijware )

Bê guman wî

Her tişt nas kiribû

Ta ko îro ji me re bûye;

Strana ser zimana,

Xup-xupa ava çem û cobaran

? navê wî bi dengê:

Qewalên piristgeha Laleş,

Zengilê Dêr û Kenîşteyan û

Melayên Mizgeftan re

Di sînga asmanê Welat

Deng vedide ûli hev vedigere

**(4)**

Bazo..!

Tu li kûye niha..!

Ez te dibînim..!

Tev milet te dibîne..!

Ey mirovê Sebirkêş û bi aram

Bavê Evîn û dilovaniyê

Parêzerê welat

Sermelekê Pêşmergeyan

**(5)**

Bazo..!

Çendî tu ji xwe bawer bû,

Ji miletê xwe piştrast bû

Dema te kelek berd nav

Deryaya kul û xeman

Ey serokê welat [welatiyê serok

Barzaniyê nemir

**(6)**

Bazo..!

Zindiyê her dem û warî

Birêzê wate û şirovekirinê

Asoyê dûr û dirêj

Dengê birûsk û tavan

Hêviya mişextî û penaberên ko,

Çavnêrên sibehên welatin

Silav silav li te bin

Silav li te bin

Ey simbolê Lehengî û afirandinê..

Mêzeke [mêzeke !

Va kevok bi aştî di asmanê welat de

Di firin

Darzeytûn bi geşî

Di pişkivin û bilind dibin

Rok bi ken

Di asmanê welat de

Xuya dike...

Silav, silav li te bin

Sermelekê Pêşmergeyan

Serokê welat, welatiyê Serok

BARZANIYÊ NEMIR]

# Jiyan bêbext û ewleye

Ji giyanê (Diyar Mihemed Seid Doskî) re diyarî)(

Dosto..!
Deh sal derbas bûn
Reşbelek bi dûv reşbelekê de
Tixûb derbas dikirin û
Bi saya te û wan reşbelekan
Dostanî fireh bû:
Reşbelek ji Dr.A.Botanî,
Mûsediq Tovî û Selah Hirorî...
Ji bo yek armancê
Yek omîdê
Yek rêbazê û
Yek Kurdistanê
Di hatin hinartin...

Dosto..!
Bi saya te
Duhok û Qamişlo
Bi hev re hatin
Hunandin
Hesîb û Serbest

Di bin barê
Metîn û reşbelekan de
Westiyan   westiyan

Dosto..!
Bi saya te
Di van deh salan de
Bi dehên reşbelekan
Bi dehên pirtûkan
Bi dehên gotaran
Bi dehên helbestan û
Bi dehên kul, êş û
Janên kurdewariyê
Li qamişo û Duhokê
Hatin nivîsandin û
Di nav rûpelên Metîn de
Belav di bûn..

Dosto..!
Bi saya te
Me Nalbend
Ji nêzîk ve naskir
Serboriya Enwerê Mayî
Ji nû ve xwend
Salih Elyûsifî û
Behaeldîn Amêdî
Di huşê me de hatin çesipandin..

Dosto..!
Raste
Di van deh salan de
Du carî çavên me
Bi dîtina hev
Hatine kil kirin
Belê me deh qat
Dilsoziya hest
Wefadariya rêbaza Barzanî û
Bê layena kurdewarî
Di kesayetiya te de naskir

Belê mixabin û
Sed carî mixabin
Qeder bêbext û ewle ye:
Çawa darek bi ber
Di salek bi ber,
Buharek bi ber û
Rojin dîrokî de
Qurquçand
Gelo çima qurquçand..?!

# *Bifire... bifire*

Bifire..!
Ev war nebû
Warekî din
Ev dinya nebû
Diyake din
Bifre..

Bibe mêvanê
Heyv û stêran.
Li ser kûpên çiyan,
Bi baz û şahînan re
Bigere..;
Di ser gelî û
Deşên dûz re
Baskan veke û
Li jêr mêzeke;
Di nav perçe ewrên
Reş û sipî de
Tu her tiştî dibînî
Gund û Bajar
çem û çiya...
Xuyadikin.
Xwe hilde jor

Li jêr tu
westiya
Barekî giran
Ji kul, xem û derdan
Xwe berdane ser milên te
Erê..Erê...
**( Yê ne li malekê**
**Nizane bi hewalekê ).**
Bifire jor..
Bifire jor..
Berê xwe bide
Nîvê din
Belkî ew nîvê jor
Saye sipî be,
Vajî nîvê jêr be
Ku saye reş e..
xwezî bi dilê
xêrxwazan û
Sed tif û dijûn li serê
Şerxwazan
Lê dinya eve;
Reş û sipîye
Xêr û şere
Erê xêr û şere..

# Dêmê min Tabloyeke ji Kul û Xeman

Erê !
Dêmê min tabloyeke
Ji kul û xeman
Portirêyeke
Ji birîn û derdan
Keser û omîdan
Her qermîçonkek
Mîna geliyê Elî Beg
 û Geliyê Zîlan
Kûr çûye
Ji hilgirtina jan û êşan
Cogan;
Cihê xwe di hinarkê
Rûyê min de kolane..
Bûme komek hestî
Ji axa vî welatê qedexe..
Çawa wê xemgînî;
Di dêmê min de
Ne diyar be
Girnijandin;

Ne dûrî lêvan be..
Çawa wê keser
Ne ji dil û hinavê
Bêne der..
Dema ku ez
Di welatê xwe de
Dîl bim..!
Gotina rast
Qedexe be !
Azadiya gotinê
Xwein be !
Gera li cîhanê
Xeyal be !
Girnijandina bi yaran re
Heram be !
Hawar û gaziya
Bi zimanê dê û bav
Qaçax be !
Çawa wê dêmê min
Ne tabloyek be
Ji kul û xeman
Çawa wê şeva min
Ne roj be,
Roja min ne derew, vir û xap bin !
Erê  !
Ne bi dil,
Dêmê min bûye
Tabloyek ji keseran

Keser di ser keserê re
Bi dar vedibin..!
Birîn di zikê birînê de
Vedibin...!
Û tev di hiş û mejî de

Dibin mêvan...!
Di damarên xwînê de
Di siksikin
Û weha,
Xwîn li ber dêmê min
Tê girtin û dêm dikeve
Rewşeke xemgîn û melûl,
Bê kes û kûs de..
Hingê;
Girnijandin xwe jê
Bi dûr dixîne,
Ken jê di reve û
Di keve rewşeke awarte de
Kor û ker, gêj û lal dibe
Mîna tabloyekî xemgîn
Li hêviye ku ji wê rewşa awarte
Rizgar bibe û
Bi azadî û serbestiyê
Şad û kamîran be an
Bi mirin û zindiyê..

# Welatiyê min!

Welatiyê min !
Da ku tu,
Bi herdû çavên xwe;
Yên mîna gola Wan û ormiya
Van helbestan bixwînî,
Bi dengekî bilind,
Mîna bilindbûna çiyayê xwe
bistirînî û
Sînga te
Tijî his û hest bibî..
Min ev hebestên xwe ji bo te
Nivîsandine..
Ev helbestên ku
Di sînga tu welatî de
Nayêne parastin
Ji sînga te welatî pêve..
Ji ber ku,
Bi serketin û şahiyên te re
Ez kêfxweş û dilşadim
Bi kul û xemên te re
Ez xemgîn û bi mitale me
Vêca tu bi kêfa xwe ye
Te divê bi xwînî

An nexwînî ?!
Kêfxweş bî
An xemgîn bî ?!
Bi nivîsandina van helbestan re
Ez xwe rehet dikim ?!

# Dotmamê!

(1)

Dotmamê !
Heger ez çiya bim û
Çiya bê mij û moran
Nebin,
Tu mij û morana minî.
Hege ez, gelî bim û
Geliyên kûr,
Bê av nabin,
Tu çam û cobarên minî.
Heger ez buhar bim û
Buhar bê gul û kulîlk nabin
Tu gul û kulîlkên minî.
Heger ez kon bim
Tu srûnek ji stûnên minî
Ez bi te me,
Bi we me,
Bi mirovê wefadar, rastû
Duristim..
Di hebûn û navtêdana te de
Gur dibim
Di ken û girnijandina te de
Dinya bi min re

Dikene
Di êş û xemgîniya te de
Dinya bi min re digirî...
Dotmamê !
Ta ku me hev naskir;
Min tu naskir
Te ez naskirim
Qederê em ji hev cuda kirin
Tifû li riya te qederê
Xwezî pêlekê
Te bêhna xwe li me
Firekiriba
Ku min têre xwe
Ji dotmamê re
Bistira
Erê bisritra.

# Dotmamê!

(2)

Dotmamê !
Ma ezê çi helbestê ji te re
Deynim ? !
Tu bûye helbesta min
Ez bûme helbesta te
Nema zanim
Çi rengê helbestan
Bi hûnim ?!
Nizanim çi hevimêşî
Ji kiras û xeftanê te re
Bikirim..?
Gelo !
Çînî, Hindî an ji Asya dûr ?
Nizanim çi zêr û zeberî
Bi ser sîng û bejna te de berdim ?
Ewrûpî, amerîkî an Ferhûnî ?
Nizanim çi rengê kolkezêrîn
Ji te re bikim diyarî
Gelo rengê spî...?
Na, na ez van tiştan tevan
Erzan û layiqî te nabînim

Tu di ser wan re ye  !
Bi tenê dibe ku
Hezkirina min ji te re
Wefadariya min bi te re
Mezintirîn diyarî be
Ji ber ku
Hevirmêş bi demê re
 Dirize
Hilgirtina zêr û zeber
Bargiranîye û
Tevî ku rengê spî
Rengê bêrîbûn,aştî û
Wefadariyê ye
Lê bi hejmar
Di nav rengên kolkezêrînê de
Spî û reş hemberî hevin
Vêca ez tiştekî ji hezkirina xwe
Çêtir nabînim ku
Ji te re bikim diyarî û
Da ku ev hezkirin
Nemir be
Va min ev helbest
Ji te re nivîsandiye.

# Kanûnê!

Kanûnê !
Koçera barkir
Çûn germiyana
Qaz û quling
Firiyan li asmana
Bi hêvîne;
Berif bibare
Çem bi herikin
Li best û newala..

Kanûnê !
Dêm tal û tirşê
Kaniya xêr û hêviyan,
Neqeba kevin û nû hatiyan
Sala temendiz
Xatir dixwaze
Nû sala jînê
Nûbûnê di xwaze..

Kanûnê !
Çileyê pêşîn û paşîn !
Tev zindî
Di malên xwe de
Mêvanin;

Însan,cenawer û balefir
Tev li hêviya
Sibatoka dînin
Li hêviya;
Jiyanek şêrînin
Li hêviya danîna tovê jînin
Li hêviya tene Kanûnê;
Ku careke din
Te bi berf û baran
Bibînin, bibînin
Li hêviya ku her sal;
Xak bizê
Dexil û devî
Geş bibin
Çûk û çivîk
Bi azadî bistirên...

Erê Kanûnê !
Xwe nûke
Xakê nûke
Mirovan nûke û
Her sal dêmê zemîn
Bike bûke, bike bûke.

# Tebaxê!

Tebaxê !
Havîna jînê
Çileyê germê !
Tu zanî ku,
Agirê hinava min
Ji agirê germa te
Bi tîn û gurtire..!

Tebaxê !
Çendî car
Te hênikbûna Çiyayê
Şerafdînê,
Herekolê Azîzan û
Sîpanê Xelatê
Anîne bîra min...
Ji ber tîna germa te
Tu her dem
Di bîranînên min de
Amade ye û
Kela dilê min
Hênik nabe

Tebaxê !
Ez jî weke te

Kelgerim û navkelî
Belê ! çima hêsir ji çavê min
Nayêne xwarê ?
Wek ku tu
Her mirovekî digirîne û
Xwêdanê ji bedena wê
Tîne xwar û
Di piçpiçîne ?!

Tebaxê  !
Çendî dixwazim;
Hêsrên min û te
Bi hev re
Ji beden û çavan
Bêne xwarê..
Lê mixabin !
Ta bi vê kêlîkê jî
Weha derfet bi dest min
Neketiye, neketiye.

Tebaxê !
Her werz,
Teyr û tilûr
Di te, tebaxa gerim de
Warê xwe vediguhêzin
Xwe li zozanan digirin,
Ser çiyayên bilind,
Ber siha berqefên hênik

Dûrî destdirêjiya mirovan di çin
Ku di aramî û tenahiyê de bijîn û
Dûrî setema germa te kevin..
Yê min Tebaxê  !
Ta bi weha derfet jî
Ji min re nîne..
Hem ez nikarim
Rondikan bibarînim
Hem cih bi guherînim !
Û her û her ez
Wek dîl û êsîran
Di nav germa te de
Xwe dibînim, xwe dibînim..

Tebaxê !
Bawer bike;
Rojên min tev tebax in
Ne bi tenê ez ji werzê
Havînê bi gazin û lome me
Na, na
Tev werzên salê
Li can û bedena min
Nayên..!
Di vê rewşê de
Nizanim, gelo !
Ez ne li gor demê me  ?!
An civata li dor min şaşe û
Xwerista me hatiye

Hatiye guhertin ?!
Tebaxê !
Rê bide min
Tenê, ku ez carekê
Bi gotinê,
Hestê xwe derînim.
Tevî ku ez
Ji tev çekan
Mame bê par...
Tebaxê !
Xuşka te zivistanê jî
Ne kêmî te şerê min dikî
Ew jî mîna te
Sitemkar û zalime..
Tebaxê !
Dibe ku;
Ez di bin dilovaniya
Herdu xuşkên te
Buhar û payîzê de
Hinekî bêhna xwe
Derdixînim û
Piçekî bi demê re
Di girnijim û di kenim..
Erê tebaxê !
Bide me hinek dilovanî
Hinek mehrevanî.

# Dara çinarê

Rêwîme
Rêwîkî westyayî me
Di nav şivîlek, duriyan û
Çardiryanên vê jînê de
Gêj û winda bûme..
Li bêhinvedanekê digerim
Li sihekê digerim
Li darekê digerim ku
Di bin siya wê de
Têr paldim,
Baş bêhna xwe berdim û
Xweş razêm..
Di vê rêwîtiya xwe de
Di ber gelek daran re
Derbas dibin,
Di şopa gelek kerwanan re
Di buhirim û
Gelek darên bi sih
Di kevin pêşiya min de..
Belê hêj siha darekê
Çavên min danegirtiye û
Kela dilê min
Hênik ne kiriye û ne
Şopekê ji şopên wan kerwanan

Ez ne birime ser şivîleka
Armanc û daxwazan !
Her û her
Çavên min
Li wê şivîlekê
Digerin
Ewa ku berê min
Bide ser wî çiyayê bilind
Bin siha wê dara çinarê
Erê bin siha wê dara çinarê..

02/08/2002

# Evîndarê zimanê Dê û bavê xwe me

Hin bîr nabin ku
Ava kaniyê girik nabe û
Hêjî bi lewlewî dibêjin;
Pesin û şabaşîyê ji
Mîr, Beg û Axan re didî..? !
Tevî ku ez
Ne berpirsiyar, serbaz û
Şêwerdarê kesekî me...
Di nasnameya min de
Doda* hatiye nivîsandin
Ji Osmanê Evdo** Hecî Kevir û
Evdê Geddo***
Fêrî deyax û berxwedanê bûme...
Ne akadîmî û
Profîsorim
Bi tenê ez
Kurdekî bi rûmet im,
Evîndarê zimanê dê û bavê xwe
me,

Guhertinên demê
Li ber çavên min
Xweş belû û diyar in û
Rastiyeke, nikarim çavên xwe ji
Vê rastiyê bi girim û
Protesto bikim...
Raste (Nû hatin kevin xelat in)
Lê mixabin!
Çîneke ji Mîr û Axayên sexte
Di nav me de şînhatine.

* * *

Ez guleyekim ji
Tuxmê azadîxwazan,
Ji tuxmê rûmetperweran...
Niştimanperwerekî
Dilsoz û wefadrim.
Bapîrên min;
Serê Şêx Abdulrehmanê
Garisî****
Jênekirin e..
Di gel Osman Paşa*****
Dora keleha (Eroxê)******
Ne girtin e..
Di dîwanxaneyên biyanîyan de
Ne stirane û ne reqisîne,
Di şeran de
Ne hatine tewandin û revyane û..

Rojekê di mala xwe de
Bi aramî ne razane...
Li vê sosretmayê !!
Ma ez şabaşiyê ji
Mîr û Began re dikim ?!

* * *

Spas ji Yezdan re
Ku ez Kurdperwerekî
Bi rûmet im,
Di deverên teng de
Min kiriye ne firotiye...

* * *

Bê gotin, pozbilindiya malbatê
Ez gelekî êşandime;
Rojekê nebûne hevalê neheqîyê,
Ji welatiyên xwe
Dûr neketine û ne bûne destik
Di destê neyarên
Welat û welatiyên xwe de.
Û weha ez Kurdekî bi rûmet
Li ( Doda ) çêbûme û
Li ser bênderên wê mezinbûme û
Di dibistana Barzanî de fêr bûme..

* * *

Erê ez bi vê çîna Axayên nû re
Nadim û nastînim û

Xweş hayê min ji guhertinên
Dinyê heye,
Xweş, bi zimanê Kurdî
Zanim bi bixwîn im û
Binivîsîn im û
Hin caran êş û janên xwe û gelê
xwe
Bi serê pênûsê dertînim...
Erê..
Ez ne peyê kesekî me,
Ne maldar û dewlemend im,
Belê bi kesayetiya xwe
Mirovekî zengîn û pozbilind im...

Doda: Gundê ku Xwedê
Helbestvan lê daye.* -
** - Osmanê Evdo: Bavê
Helbestvan Konê Reş e
*** - Evdê Geddo û Hecî Kevir:
Du hempayên gundê Doda bûn,
hersiyan berberîya hev dikirin.
**** - Şêx Abdulrehmanê Garisî:
Yek bû ji lehengên şoreşa Agirî.Di
sala 1933 an de,xulamê wî Nicmo
,bi bêbextî ew kujt,serê wî jêkir û
ji Tirkan re bir.
***** - Osman Paşa: Paşayekî
Tirkan bû. Di sala 1847 an de,

şerê  mîr Bedirxan kir û Yezdanşêr bû hevalê wî di hilweşandina mîrnîşiya Botan de..
****** - Eroxê an Hewrexê:
Keleha Hewrexê ye a ku Mîr Bedirxan ê Azîzî (Botî ) têde asê bibû ji ber Osman Paşa û artêşa tirkan...

# Di Dadgeha Yezdanî de

Di Dadgeha Yezdanî de,
Min bi têr û tesel
Bervedêriya xwe kir..
Dadyar, bi bawerî
Tev tawan û bêbextiyên ku
Bi ser min de hatine avêtin,
Riswa û mehû kirin..
Paş ku xêz li bin wan xistin
Ji min pirsî:
Tu çi dixwazî ?
Ji ber ku min kurdayetî
Di malbatên mezin û dêrîn de
didît,
Ez dilbijokê wan bûm û
Rêzgirtinek wan li bal min hebû
Min jê xwest ku
Ji du malbatan
Heft bavikan (Nifşan)
Şanî min bide..
Belê, çendî min xwe

Di nav poşmanî û mixabiniyê de
dît;
Dema ku min;
Di nav wan bavikan de
Bêbext, keysbaz, keleş, oldar, hov,
mêrxas û
Xwedênenas û dîtin..

# Hevalê!

Ew siwarê nêçîrvanî,
Yê ku li Beriya Mêrdînê
Dabû pey Xezala xwe..
Piştî bezeke bi westandin û
Helkehelk..
Nêçîrvanekî sexte û keysebaz
Bi hêsanî Xezala wî
Di nav davikên xapandina xwe de
Dîl kir û ji xwe re girt..
Û wiha ew Xezal
Di nav rewrewk û leylanê de
Ji ber çavê wî winda bû..
Ew siwar jî polîpoşman
Li warê xwe vegeriya û
Kevirekî nû ji bêbextî û
Poşmaniya yaran
Di keleha warê xwe de
Danî..

# Rengê Spî

Bi hebûna gerdûnê re
Reng hene.
Tev ji keskesorê hatine der
Spî û reş
Kesik û sor
Şîn û zer.. Û
**Di nav wan de şer e**
Tev şerê rengê spî dikin.
Tev hewildidin ku
Rengê spî bi lewitînin..
Tev razî nabin ku
Rengê spî,
Spî bimîn e.

# Mirovantî

Kêm kes digihêjin
Pileya mirovantiyê
Kêm kes karin bi kar û barê
Mirovantiyê rabin
Tevî ku em tev
Bi nav mirovin..
Mirovantî;
Bi xwekarî û mêranîye
Mirovantî;
Gernasiya dema nû ye..
Kesê ku bi rast û durist
Mirov be, ewe yê ku
Jê bê xwestin
Pêşûsazê neyarê xwe
Ji dil û can pêk bîne
Wek ku yê xwe
Pêk tîne
Încax;
Wek wan kesan
Gîhabin pileya mirovantiyê.

# Zeriya min!
# Dema Dengê te
# Seh dikim..

Zeriya min !
Di vê zivistanê de
Bayê bê dest
Bi tiliyên xwe yên sar
Aso hembêz dike..
Daristanên tazî û rût
Di nav qir û sermê de
Di nixumîne..
Çûk û çivîk
Bê star
Li ser şaxikên daran
Bi melûlî xuya dikin û
Ji neçarî
Ji reşewran
Sirûdên şîniyê dibêjin...
Awazên wan
Tevlî xuşîniya daristanê dibe û
Mîna sîmfoniyeke xemgîn û bi xem
Min di nav kul û keseran de
Kûr û dûr dibe..

Lê Zeriya min !
Dema ku ez dengê te seh dikim
Wek zengilê naqosa Dêrê ku lê
bide
Min ji nav kul û xeman
Hişyar û rizgar dike û
Geşbîniyekê bi ser min de
Dibarîne
Erê geşbîniyekê..

# Zeriya min! Dema tu tê bîra min

Zeriya min !
Xweristê bi dêm tirşî
Konê xwe di ser kavlê min re
Vegirtiye
Reşewir bi xemgînî
Di ser banê min re
Di buhirin
Ew çend darên di hewşa min de
Bi ponij û mitale ne û
Êdî nema ew kevokên
Şîn û spî
Bi şadî di ser mala Min re
Di firin...
Xemgîniyê li dor xwe dibînim
Bi can û bê can li dor min
Bi kovan û keser xuya ne...
Lê Zeriya min !
Dema tu tê bîra min
Coşek,heyecanek û şahiyek
Min hiltîne û yek min datîne
Ew xemgîniya ku ez têde
Dibe rewrewk û leylan û

Bi tenê wêneyê te
Li ber çavê min dimîne
Tu bi min re
Di girnije û dikene û
Wiha ez her tiştî dispêrim
Qederê

# Zeriya min!
# Min her tişt
# spartiye qederê

-١-

Zeriya min !
Nizanim, gelo ezê çilo
Girêkên veşartî yên vê jiyanê
Vekim..?!
Bahozê tev demsal
Dane ber xwe
Ji hev dirandine û
Belawela kirine..
Ew sira bayê xerbî
Di tûrikê xwe de
Veşartiye û
Di ser bedena minî birîndar re
Derbas dibe..
Min jî her tişt spartiya qederê
Erê qederê

-٢-

Zeriya min !
Helbest razaye
Gotin pûç û bê sûde ye

Bejna êşê
Ji bejna canê min
Bilindtire..
Êdî nema
Cudahiyê di navbera
Gotin û helbestê de
Dibînim..?!
Dibe rojekê
Gotin bibe mîna
Guleyên agirîn û
Helbest bibe mîna
Mûşekan û bi teqin
Wê hingê wê
Mîrneşîn ji ber wan
Bêne hejandin û herifandin
Ew roja ku
Bahoz rabe û
Hesip bişîhin..
Hingê wê
Baran bibare, erê baran.

# Zeriya min!
# Dema xatir ji te dixwazim..

Zeriya min !
Dema ku ez xatir ji te dixwazim;
Bê hêz û melûl
Dibim
Girnijandin û ken
Ji min di revin
Hêsir di çavê min de
Kom dibin
Tiliyên dest di lerizin û
Bi tirs, silavên xatirxwestinê ji te
Dixwazin..

Zeriya min !
Dema ez dêmê te winda dikim;
Di nav bahoza xewin û xeyalan de
Di mînim
Can, di nav rewrewk û leylanê de
Li ber ba dibe
Şîhîniya hespan
Di hinavê min de

Li dahola dûrbîniyê
Dixîne û
Dem, firehtirîn qunaxan
Di navbera min û te de
Ava dike..

Hingê Zeriya min !
Agirê bêrîkirina te
Min di sotîne û
di êşim, pir di êşim
Rojan di êşînim
Roj min di êşînin..
Û wiha xwe jibîr dikim,
Xewin min ji bîr dikin û
Toşî kul, xem û bêrîkirina te
Dibim..

Zeriya min !
Di dûrbûna te de
Şahiyên min yên dûr
Jibîr dibin
Şîn û şadiyên min dibin
Wek hev û
Êdî nema cûdahiyê di navbera
Ken û girî,
Razan û şiyariyê de
Dibînim û
Ji neçarî ez

Ala têkçûna xwe
ji dostan û hevalan re
Bilind dikim...

Erê Zeriyê
Eve halê min ?!
Bi hêvîme
Di dûrbûnê de
Tu nebe hevpara jiyana min
Tu deriyê dilê xwe ne qepitîne
Tu bi min re nekeve şeran de
Tu çûk û çivîkan ji nav buhara min
Ne qewirîne û
Perperîkan ji ser gul û kulîlkên min
Ne firîne...
Ji xwe bi wan
Ez sebra xwe tînim
Ji ber ku tu ji min re
Kaniya evînê ye
Nanê hêviya ye û
Xwêya jiyanê ye.

# Zeriya Min!
# Dema Sira Bayê Xerbî Radibe..

Zeriya min!
Dema sira bayê xerbî
Bi ser min de radibe û
Xwe li min di pêçe
Meh û demsal
Li ber çavên min
Di ser hev re
Di qulipin û di fitilin..
Baran li ser peravê dilê min
Di bare û
Gemî di nav bêrîkirina
Evîna deryaya te de
Binav dibin..
Tevzînok bi laş ve
Hildikişin..
Xwîn,
Di damarên rehên min de
Di kele û

Êdî nema tilî
Bi daxwazên dest
Radibin..
Wiha hestê şeşan
Di nav demsal,baran û
Reşewran de
Ji xew şiyar dibe.

*   * *

Zeriya min !
Dema bayê xerbî radibe
Te,
Di ciwantirîn, naziktirîn û
Spehîtirîn rewş de
dibînim û
Xwe,
Di bilindtirîn
Pileyên helbestvaniyê de
Dibînim..
Pêre-pêre jî
Li biçûkaniya xwe
Vedigerim û wiha
Hilma te
Dengê te û
Wêneyê te
Di hiş û xeyala min de
Diçin û tên...

*    * *

Zeriya min !
Dema bayê xerbî bi ser min de
Dibare..
Dengê awazê pêlan
Di nav damarên xwîna xwe de
Seh dikim û
Hezkirina min ji te re
Di girêdana di nav demsalan de
Di şoreşa volqanan de
Di reqsa gulan de
Di afirandina bilbilan de
Diyar û eşkere dibe..
Dawî dibînim ku
Hezkirina min ji te re
Çîrokek ji çîrokên
Pirtûka evîndara ye.

*    * *

Zeriya min !
Dema bayê xerbî radibe
Êdî nema karim wek
Evîndarekî şaristanî
Bi te re bigirnijim û bi kenim
Tev şaristaniya xwe
Di ser guhan re davêjim
Tev nivîsandinên xwe di dirînim
Pirtûkên xwe di dişewitînim û

Biryarê distînim ku
Ezê bê pêşwazî
Te hembêz bikim..
Bê şahî û govend
Bê pênûs û xame
Te li rex xwe deynim..
Nivîsandina di navbera
Yekî weke min û
Zeriyeke weke te de
Gunehkariye Zeriya min û
Bi dûrxistina qederê ye.

# Zeriya Min !
# Minê bêtir hez te kiriba..

-١-

Zeriya min !
Minê bêtir hez te kiriba ku;
Te Doda ji xeyala min
Avêtiba
Dêmê Xensê ji ber cavê min
Windakiriba
Besta Zixur û Kevirê Birûskê
Ji bîranînên min
Biriba..
Minê
Bêtir hez te kiriba.

-٢-

Zeriya min !
Minê bêtir hez te kiriba ku;
Te karîba rêka kerwanê min
Dageranda
Te bihişta çûk û çivîk
Bê xem
Sirûdên şahiyê bibêjin
Te kefa deryayê li ser

Bênderên Doda
Komkiriba û
Agir bi rewrewka çolistanê
Xistiba..
Tu zanî Zeriya min?!
Hingê minê bêtir hez te
Kiriba.

-٣-

Zeriya min !
Minê bêtir hez te kiriba ku;
Te dilê min ji hezkirina xwe
Daweşanda
Dilê xwe ji hezkirina min
Vala kiriba
Minê bêtir ji te hez kiriba.
Minê bêtir ji te hezkiriba ku;
Min bakur ji başûr
Naskirina
Cudahî
Di navbera havîn û zivistanê de
Dîtiba..
Wê hingê minê bêtir ji te
Hez kiriba

-٤-

Zeriya min !
Minê bêtir hez te kiriba hu;
Te ez, ji vê sergêjekê, tayê,

Halê û nexweşiyê
Rizgar kiribama,
Ji vê heyr û belê
Serbest kiribama
Bê guman minê bêtir
Hez te kiriba..

-٥-

Zeriya min !
Minê bêtir hez te kiriba ku;
Xezalên mîna te
Careke din bi azadî
Di Beriya Mêrdînê de
Bi çêryana
Koçerên zozana
Bê tirs ji tixûban
Berê xwe bidana germiyana
Ava çemê Ceqceq û Xabûr
Wek heyamê berê
Bi herikya..
Hingê Zeriya min;
Wê nêçîrvaniyên mîna min
Xwe li ser xezalên mîna te
Kujtibana..
Û roja îro,
Tu ji min re ne dibû
kul û keder..

-٦-

Zeriya min !
Minê bêtir hez te kiriba ku;
Min;
Kul û xemên xwe ji te re
Bi dar vekiribana
Te;
Hêvî û daxwazên xwe ji min re
Bi gotina
Me herdiwan
Bi destê hev bi girta
Hev birevanda Amedê
Xwe bavêta tor û bextê
(Şêx Seîd Efendî)
Şehîdê şehîdan

Ma, wê kê henek û tenazê xwe
Bi me kiriba Zeriya min ..?!
Ez hez te dikim
Vê hezkirinê
Ev gotinên taşomaşo
Deranîne Zeriya min,
Zeriya min.

Qamişlo 13/05/2004

Doda: Gundê ku Xwedê
Helbestvan lê daye.
Xensê:Diya Helbestvan e.
Besta Zixur û Kevirê Birûskê: Du cihên navdarin li gundê Doda.

# Zeriya min! Bela wiha be..?!

Zeriya min !
Bela wiha be;
Bela pêvedanên
Sibehên vê zivistanê
Dîrokê tomar bikin..
Kerwan,
Qunaxê dispêre qunaxê
Seh jî bi dûv de direyên..
Bela bi kewtkewt bin.

Darên beriwan
Ku ne li ser çiyayên bilind bin
Şîn nayên
Stêr li ser bênderan
Nayên dîtin.

Zeriya min !
Ji wan gere,
Çax û demê me nîne
Ku em tozê ji ser pêlavên xwe
Daweşîn in.
Çi daxwaza ewên ku,
Bi zikreşî hewildidin

Hezkirin û çakiyê
Nizim bikin
Bela ew be
Guh li wan neke.
Bawer be,
Wê gul di destê me de
Şîn bên û
Tûmê zindiyê  di mala me de
Bê danîn...

Li paş ne zîvire Zeriya min
Bela dexsok û kînok
Xwe bi zîwan û xurêla me re
Bi westînin
Em xwediyê kerwanê ronahiyê ne
Dergehên deryayê li ber me
Vekirîne
Em xweş dikarin bi tîpan
Mora xwe li pişta salan û
Kesan xînin...

Bela wiha be Zeriya min
Lê ku kazînî ji dengvedanê hat
Pêwîste em bilivin pêş
Pêş ji me re ye
Ma tu nizanî;
Çendîn qunaxên fireh
Di navbera hezkirina me û

Qurqura beqan de heye..

Vexwe Zeriya min
Nûşîncan be
Peyal bi dûv peyalê de
Li ber destê te rêz dibin...
Tê bê çi ku sibe an dusibe
Ez dûrî te ketim
Gelo tê ji min re
Deryayê bi çine an
Çiyayan bi çîne..!
Tê bê çi ku min ji te re got:
Zeriyê min !
Min bêriya te kiriye û
Bela qurîncek û stirî
Têkevin nav laşê wan de...
Wê çi bibe ku tu ji min re bibêjî:
Min bêriya te kiriye
Tu zanî Zeriya min;
wê hingê ezê bibim
Mîna xortekî 16 salî
Erê 16 salî û
Bela wiha be
Zeriya min.

01/10/2004

# Zeriya min!

Were Zeriya min were !
Bi kûve direvî ?!
Tê bi kûve herî û
Vî dilê reben
Bi xwe re bibî ?!
Te nîvê bi evîn ji min
Dizîye
Nîvê hîledarî,
Ji laşê min re hiştiye ?!
Were vî nîvê jî ji xwe re
Bibe..
Ne ev nîv dikare bi hilgirtina barê
laş
Rabe û
Ne laş dikare bi heza vî nîvê hejar
û belengaz
Bijî..

Were, te ez di navbera jiyîn û
mirinê de
Hiştime..!
Tu û mirin li bal min bûne
Wek hev..!

Hêza we herdiwan
Wek heve
Her yek ji we min bi dûv xwe de
Di kişkişîne...
Ez jî di vê navê de,
Bê çare û şaşomaşo
Mame,
Serî li min hatiye
Gerandin..
Êdî nema bakur ji başûr
Nasdikim,
Çiya û geliyan ji hev
Derdixim û
Şev û rojê ji hev
Di tefsilînim...

Were Zeriya min were !
Were û
Herdû nîvên dil
Bi hev ve perçîm bike
Ji nû agirê dil
Dade û
Bi ardiwê evîna xwe
Gur bike...

Were !
Netebitîbûn û bêhedaniya min
Çareser bike

Kêmasiyên min
Şanî min bide
Kilîta windayên min
Bixe destê min..

Were, belkî tu aveke sar
Bi ser agirê hinavê min de
Dakî û vemirînî..!
Penaberiya ku ez têde
Dijîm,
Dûrbûn û cefaya ku ez di nav de
Raketîme
Nêzîk bikî...

Were Zeriya min !
Were, min li welatê min
Vegerîne !
Hêjî pîne li şûna pîne
Têne dirûtin
Di şûn daristanên şewitî de
Derfet heye ku em ji nû
Daran biçînin,
Tenûra temirî careke din
Dadin,
Xaka ku ji dehê salan ve beyare
Careke din bajon û
Tovekî nû di qata vê jînê de
Werkin.

Raste !
likumandina bi dûv likumandinê
de
Westandine lê Zeriya min !
Likumandin
Nîşana berdewamî û
Hezkirina  jiyanê ye
De were, dem  dilovaniyê nake û
Vî dilê reben  rehet bike.

# Rinda Min!

Rinda min !
Vê carê ji nedîbûna te bi tirs im
Ez fêrî wiha nedîbûn ne bûme..
Bi hêvîme her dem
Bêrîbûna min geş be,
wek geşbûna van kulîlkên hewşa min,
Evên ku her sibeh
Ez wan av didim.

*   * *

Rinda min !
Berî ku tu bê,
Di xwazim riwê min qusandî be
Cilên nû li min bin
Pêlava min boyax kirî be..
Çendî ev çavnêrî û bendewariya
Di hinavê min de
Çepel û megrûdî ye..

*   *   *

Rinda min !
Te ji min re got:
Telefonê veneke, ezê bêm..
Min ji te re got: Bela wek te be

Ji te werê axaftina me
Li dor tiştin bê nirx û qîmetin,
Ne li dor hebûna me û
Rawestandina demê ne..
Ne tu hat û ne te telefon venekir..
Min xwe negirt...

Gelo ! Tu berpirsyare an civat û roj
Bi berpirsyariya şîn û şadiya hestê me
Radibin..?!
Di be ku ez bi xwe berpirsyar bim..!
Min gotinên nexweş ji te re dêran bin..!
Pêwîstbû min çend carekî,
Ji rastiya te re bi lîlanda
Erê bi lîlanda...
Lê piştî çi Rinda min...?!
Helez bihirt.

Rinda min !
Hêjî tu nebedî ye...
Hêjî ez, di nav dirêjbûna rojan de
Çavnêrîya sehkirina dengê te dikim..!
Di hundirê xwe de
Di kelim, di fûrim û di ponijim

Tiştekî li dor xwe nabînim
Tiştek li ber çavên min
Nayê dîtin...

Di hinavê min de,
Zinar û Lat
Têne şikenandin..
Şîndar di dilê min de
Têne birîn...
Gelo kê evqas kêr anîne û
Şahiya canê min dane ber birînê ?!
Çima hawar, gazî û protasto nakim
û
Xwe di xapînim..? !

Gelo ! Ez fêrî bê dengî û aramiyê
bûme ?!
An fêrî qalûqultên derewîn û
xapînok bûme ?!
An ez bûme mirovekî ku
Nikare rastiyê bibêje..!
Û ji ewên ku derewan dikin re
bibêjim:
Hûn derewan dikin û
Ji ewa ku ez gelekî li hêviya
Wê bûm bibêjim:
Êdî bes were...
Heliz buhirt.

*         * *

Rinda min !
Bawer bike dema ku tu bê
Ezê bi germî pêşwaziya te bikim,
Bi herdû destan,
Te hembêz bikim..
Xuyaye hêjjî, ez nebûme kevir..
Di tirsim ku ziman li pêş te bi
herbile û
Wek ku te di dûrbûnê de
Zoriya min biriye..
Wek ku te ez di nav
Êş û xemên jibîrkirinê ne strame..
Ezê xwe bibînim ku
Ez te dipexişînim û di te de
dibuhirim..
De hela tu jî min bi pexşîn e...?
Gelo !
Ev hezêkirine..?
An Jibîrkirin, lêborîn û
pexişandine..??!
Min tu şirove ji vî hestê xwe re
nedît..
Her sawêrên te
Ji ber çavên min narin..
Gotinên te di qulên guhê min de
Bi zinge zingin in...

Û bê hemid ez bi dûv te de
Di livim û li te di gerim
Erê ez li te di gerim
Tevî ku,
Helez bihirî
Rinda min.

٢٠٠٦/٠٦/٠٦

# BELA KÊFA WÊ BÊ

Bela kêfa wê bê
Ez canê xwe didim hev û
Di bezim..
Tasek av,
Têra şûştina bedena min
Dike..

Bela kêfa wê bê
Ez bi çîrok û çîvanokan
Avis bûme..
Sed nefret li vê kaxeta spî û
Bê deng bibare ku
Bi hêsran belek dibe...
Devê sikakan venekin
Min agirê hinava xwe
Di wan de veşartiye...

Bela kêfa wê bê
Çemçikek av
Têra zîvariya min dike ku
Ez pê bêhuşiya rojên xwe
Derbas bikim..
Beşişandin,

Ne nîşana kenê ji dile..

Bela kêfa wê bê
Ez canê xwe didim hev û
Hezkirina wê bi min re
Dirêj dibe ta ku
Min di xeniqîne,
Tev tîpan li bin guhê hev dixîne û
Tu şiroveyên bi wate
Jêre nabînim..
Min hez wê kir
Wek agirê ku bi firêzeya
Beriya Mêrdînê keve,
Şewitî..
Dengê hezkirinê
Hin bi hin di bile..
Ez jî,
Tev dûrbûn û dawîbûnan
Beravêtî dikim,
Rojan bi temamî
Di nexşeya jiyanê de
Derbas dikim..
Bela ew,
Bi têr û tesel razê û
Xwenên şêrîn bibîne..

Bela kêfa wê bê
Tikaye,

Min di navtara mikurbûnê re
Derbaskin
Pêlekê, min li wê qunaxê
Rawestînin ku ez
Bi dengekî bilind
Di nav we de mikur bêm,
Xatir ji evîna wê bi xwazim û
Wek kevokekê ji nav
Herdû destên xwe berdim..
Bela di ser canê bedena min re
Bi fire, derbas bibe û
Agirê evîna wê bi temire..

Bela kêfa wê bê
Ez canê xwe didim hev û
Ber bi dînbûnê ve baz didim
Erê, ber bi dînbûnê ve baz didim û
Bela kêfa wê bê...

Roja 10/07/2006,

# Tikaye nekin seravde ji min re!

Zeriya min!
Tu di dilê min de
Mehînek kehêl bû..
Ez di dilê te de
Siwarekî bi hêl û mêl bûm..
Herdû dilan, li mêrgekê, çayirekê
Biharekê  hev didîtin…
Gelo iro, ew bihar ji wan re
gereke?

*          *          *

Jenên dil wek xwe ne..
Dil di davikên kesî de nehatiye dîl
kirin.
Azade, serbeste, resene..
Û tevî ku nemroya telefona te,
ewa ku di ser refika pirtûkxaneya
dil re
bê guhdan avêtî ye..

Lê mixabin!
Min di xwe re nedît lê mêze
bikim…?!

*          *          *

Û bihar derbas bûn,
Bêrîkirina wan kêlîkan gazin kirin,
Û kirasê xwe çirand…
Va careke din em li hev dibin
mêvan
Di bihareke din de hev dibînin û
Dest di seqema asoyê bêrîkirin û
germê de
Dirêjî hev dibin…
Lê tu dibêjî qey yekemîn care hev
dibînin;
Nizanim çima dest diricife !!
Nasên hev bûn..?!
Çima iro
Di asoyê vî temenê kurt de wek
biyaniyan
Xwe dibînin, xwe dibînin?!
Va em bi hev re ne,
Lê gelo raste em du evîndarin?
Çav, ji awirên çav direvin..û xwe
di qurmiçîn in..
Erê carekê, rojekê ji rojan
Tiştek di dilê me de hebû…

Lê bahozekê, volqanekê ew tişt
temirand…
Erê temirand.

12/11/2007

# Jiyan Bendewarî ye

Ho delalê..!
Dem buhar e
Meh nîsan e
Esman saye şîn
Xuya dike
Xweristê xemil û
Xêza bûkanî
Li xwe kiriye
Ciwan e
Geş e
Bi ken e..
Di vê buharê de
Zanim;
Çendî roj
Te çavnerîna min
Kiriye..
Çendî car
Tu berzûrî Xwedê
Bûye û
Ez nehatim..?!
Nehatim..?!
Ho delalê..!

Dilê te bi te
Ne şewite
Tu nifiran tu
Li min nekî
Gelekên wek min û te
Bi agirê  qidoşiyê
Hatine şewitandin...
Gelek salan
Dexil û zevî
Li hêviya baranê mane û
Baran ne barya ye
Gelek girtiyên
Bê sûc û guneh
Bi salan
Di zindanan de
Razane
Erê ez nehatim
Ne ku min
Di ser serê xwe re
Avêtiye an
Ji bîra kiriye...

Ho delalê..!
Ku ne ji Bekoyan ba
Wê Mih û Gur
Bi hevre bi çêryana..
Ku ne ji çikûza ba
Wê feqîr û xizan

Di welatê min de
Kêm bana..
Ku ne ji zikreşa ba
Wê her Zînek
Bi Memê xwe re
Di vê buhara rengîn de
Derketa seyranan...
Û niha
Ne te çavnêriya min
Dikir û
Ne ezê wisa
Bi keftileft û
Bê tebat bûma...
De ne xeme
Mane jiyan bendewarî ye.

Qamişlo 24/04/2003

# Dil birîndarê te ye!

Zeriyê !
Ta sibê
Ezê bêjim
Bê poşmanî; Bijî bijî û
Aferîn..

Çendî zerîyên
Spehî di sikak û
Kolanên qamişloka
Evînê de
Di bînim;
Bejin ziravin,
Çav belekin,
Dêm şêrînin,
Por hevirmêşîn in,
Lêv hingivîn in
Bîna parfana wan
Miriyan şiyar dike
Heger perî hebin;
Ew perîyên cinetê bi xwe ne
Di nav wan de

Mat û sosretmayî
Dimînim û
Dil
Tê guvaştin..

Her yek ji wan
Ciwanî û spehîbûna xwe
Diyar dike,
Hin bi hejandina mijgolan
Hin bi xilandina bejin û balê û
Hin bi berzbûna
Sîng û memikan..
Bê guman tev li ber çavên min
Xezalên binê beriyê ne,
Wek gul û kulîlkên
Nû pişkivî
Di gulîstaneke rengîn de
Û tev di dilê min de
Reqis û semayê dikin..
Lê mixabin;
Dil birîndarê te ye !
Beriya ku xezalên mîna te
Lê neçêrin
Ne beriya mine
Gulîstana ku tu
Ne di nav debî
Ne gulîstana mine
Çibikim ji baxê Gulan

Ku gula min ne di nav debî
Çibkim ji şox, şeng û
Qeşengan
Ku gewra min
 Ne li rex min bî..
Bê guman ew tev gulin
Lê bilbilên wek min
Dinalin
Li ser gula xwe bi tenê
Her gulek bi bilbile û
Tevî ku ez bilbilim
Lê gula min ne li vire
Çendî dil bi kêf û şad bî
Bi jen û heyecan bî
Bi dîtina weha gul;
Gewir û esmerzeriyan
Polî poşman ez dimînim
Bi tenê
Lê bi geşbûnî dibêjim:
Her bijîn gulên ciwan
Çax û demê we
 Buhar bin
Newroz û
Salên ciwan.

# Xulamên xulamokan e

Xulamên xulamokan
Çavnêrî û zêrevaniya
Şopa û şûna te û
Pîş û sazê te
Dikin..
Hewil didin bahoza te ya gur
Rawestînin..
Gelo keviz dikare deryayê
Beden bike ?
An;
Burc ji qûmê têne
Avakirin ?
Guh li wan neke..
Çendî perperîk
Li dor çirayê kom bibin
Xwe di şewitînin û
Xweş nîşane
Ji ronahiya çirayê re.

Xemgînî tu ?
Ji ber ku derew û xap
Li te kirine û dikin ?
An bazirganiyê

Bi navê te dikin ?!
Ne xeme..
Bi vir û xapan
Rojên xwe derbas dikin.
Ji wan werê kes wan nas nake,
Bîr nabin ku
Wek rewrewkê ne
Çendî mirov nêzîkî wan bibe
Têne veşartin û
Çendî dûrî wan keve
Belû û eşkere dibin.

Carna tu şiyar dibe ku
Xwe di pişt rewrewkê de
Veşartine,
Bi kîn û zikreşî
Dane ser şopa te û
Bi bê dengî şerê te dikin.
Hewil didin bi navê te
Bazirganiyê bikin û
Te bi guherînin,
Rêbaza te li ber çavê te
Reş bikin û dawî
Te bikin xulamekî mîna xwe ..
Pêwîste tu bi wan re bikene
Ji ber ku ew koleyên demê ne
Nêzîk,
Wê dem dêmê wan

Yê rast eşkere û belû bike
Ma te ev gotina pêşiyan
sehnekiriye:
)Tu çi tovî di xakê de bi reşîne
Tê berê wî tovî hilîne).

Bi girnije..
Te ew kirine sergêjekeke mezin de
Tu bûye barekî giran
Li ser milên wan
Di bin giraniya barê te de
Xew li wan di herime û
Ew çend gotinên ku tu dinivîsîne
Ji wan re bûye kul û xem..
Bi live..li paş xwe nezîvire
Ew xulamên xulamokan e.

# Bela bimire..?!

-١-

Bela bimire yê ku;
Ji bavê xwe fedî bike !
Li kul û xemên xuşka xwe
Guhdarî neke
Li diya xwe ne pirse
Adet û teqalîdên bav û kalên xwe
Jibîr bike
Zimanê xwe di ser guhan re
Bavêje û
Deriyê xwe ji ber dost û hevalan
Bi qepitîne
Bela bimire jêre çêtire

-٢-

Bela bimire yê ku;
Ji ronahiyê bi tirs be
Di tariyê de bi live
Wek kund li ser şikêran
Bi lûse
Di tengayiyê de
Kirasê neyaran li xweke
Di firehiyê de

Wek dîkê şinik
Bi qud-qud be..!
Serê xwe ji Partiyan re deyne
Berî çiyayên welatê xwe û
Di her çax û demî de
Di her civat û eywanê de
Karibe bistirê û biraqise
Bela weke van kesan bimirin
Mirin ji wan re çêtire

-٣-

Cerê ku av têde
Nesekine
Yê şikenandinê ye
Beriya ku xezal
Lê neçêrin
Ne warê koçeryê ye
Çiyayê ku Pêşmêrge
Lê neyên parastin
Ne cihê piştdanê ye
Hevalê ku zikreş be û
Bi hewildan be ku
Li ser pişta hevalên xwe
cihekî ji xwe re
Di civatê de ava bike
Megrûdî û eware ye
Qet lê nebe ewle ye
Bela bimire, mirin jêre çêtire

-٤-

Xincera ku ji kalan neyê der
Ya avêtinê ye
Tivinga bê berik be
Mîna şîşa tenûrê ye
Kum û kolozê ku
Serî gerim neke
Ne yê danînê ye û
Mirovê ku sinc û wijdan
Wî ne hejîne
Mirin jêre çê ye..

# Doda, Barzanî û Ala welatê min

Di vê jiyanê de
Min gelek kes  naskirin û
Hez gelek tiştan kir
Hin ji wan
Di çavê min de
Mezin bûn û
Hezkirina wan bi min re ma
Ta ku mirin
Lê bi tenê sê nav
Di cihekî bilind de
Li ser refika dilê min
 Hatine danîn û parastin
Her ku dem bi pêşde diçe
Di çavê min,nerîna min û
Huşê min de
 Mezintir dibin
Sînor xwe ji ber rêzgirtina wan
Dide alî..
Ezê bi mirim wê ew bimînin zindî
Heger we naskir
Bê ew hersê nav kîne ?!
Yek ji wan gundê min Doda ye
Yek Barzaniyê nemire û
Yek Ala welatê min e.

# Zêrevano!

Şiyar be
Zêrevano !
Destên min
Bi stêrkan dagirtîne
Ez hawar hawara
Di navbera (Serxet û Binxetê) de
Kom dikim
Bi dûv gotina (Nan û Avê) de
Dibezim..û
Tu zêrevaniya min dikî !
Çi dinivîsim, bi kûde dirim û têm,
Bi kêre didim û distînim..
Waweylê li vê sosretmayê !

Raweste zêrevano !
Ez gelekî zelalim;
Girnijandinan
Ji ser dêmê dayika xwe û te
Didim hev,
Bismaran ji henekpêkirina li xwe û
te
Radikim û hêjî
Tu zêrevaniya min dikî.. !
Zêrevaniya deryayê

Neke
Di deryayê de
Nebe nêçîrvanê masiyan
Ji neyaran re,
  Masiyan ne tirsine !
Xemgîniya qeyikvanyan
Dûbare neke !
Û refê qitkan
Ji ser xaka welatê birîndar
Bi zêrevaniya xwe
Dîl neke û
Ne firîne.. !
Cihê tu têre
Derbas dibî
Nakokî û berberî
 Têde şîn tê û
Bêhna genî
 Belav dibe...

Pêlekê raweste;
Tu nikare gerdûnê bi zêrevaniya
xwe
Zindan bikî an
Aso bi gelaciya xwe
Zinar bikî..

Pêlekê raweste
Da ku sibe tu dîn nebe

Û zarokên te nifiran li te ne kin

Çima evqas Zêrevanî ?!
Gelo raste:
Nav li ber tavaheyvê
 Têne nivîsandin..?!

Pêlekê raweste
Her berê kerwan li oxirê ye
Seh li dorê bi kewt kewtin
Xuyaye tu nikare xwe
Ji Zêrevaniyê bişo
Tu ne bawere ku
Berik ji kenê zarokan
Şerm û fedî dikin û
Baran tê xak pesnê xwe dide...

Xwe bide alî
Zêrevano û
Pêlekê bigirî
Da ku tu nêzîkî Xwedê bibî
Bigirî da ku
Em ji te bawer bikin ku
Tu mirovî,
Tu sitêrkan
Gulebaran nakî,
Tu darên bilind

Gunehkar nakî..

Hay be
 Zêrevano !
Yê çê her li pêşiyê ye
Pozbilindî nayê tewandin
Devê elfabêya mirovantiyê
Qet nayê dirûtin...
Tev eynik wê bêne şikestin
Lê bîranîn xwe ji pîjikên wan re
Xûz nakin..
Bawer neke ku
Bi hebûna te
Berbang di nav xwîna me de
Der nabe..
Û çiya li xaka welat siwar
Nabin..
Bi dûr keve Zêrevano !
Tu jî mîna Beko ye
Her bi zêrevaniya xwe
Ji neyaran re
Tu çê ye.

Qamişlo

# KURTEPISTEK DI GUHÊ TE DE

1

Di welatê min de;
Dema ku xerab di govenda şerê te de
Biraqisin..
Zikreş di bin simbêlan re
Bikenin..
Dîkên şinik li ser tingê mala te
Bi qud - qud bin
Hingê xweş bawer be ku tu bi serketiye.

2

Madem çolistana fireh û bê deng,
Gir, hêrik û qelaçên ker
Bi aso re dirêjî asman dibin û
Têkiliyan pêre datînin..
Pêwiste tu biaxifie..

3

Dema ku kêlîkên dijwar û çetîn,
Bîstikên xweş û şêrîn û
Salên dirêj derbas dibin

Çima tê li hespa demê siwar
nebe..

4

Di welatê min de;
Şêrên birçî di hêrik û geliyan de
Xwe di qurmiçîn in û
Gurên har li ber tava heyvê
Diraqisin.

5

Bixwîne bê çi dinivîsim;
Ev buyera ha carekê li Qamişlo
Qewimiye..

6

Warê şah û melekan
Ji xwe re neke war
Bawer be gelek kesên
Li dor wan
Di xemgîniyê de
Dijîn.

15/03/2008

# Dem Wek Şivîlekê Derbas Dibe*

- 1 –

Dar şipya bilind dibin û
Şipya dimrin.
Ku bahoz li dor te rabû
Şpya bimîne,
Xwe jêre xûz neke
Wê derbas bibe..
Dibe te bihejîne,
Hespê te bilikumîne
Lê her wê di nav lingên te re
Derbas bibe.

- 2 –

Ta ku tu oxireke dirêj derbas bikî
Demek dirêj derbas dibe
Ta ku tu xweşiya biharê,
Germa havînê,
Toza payîzê û
Serma zivistanê bibînî
Demek dirêj derbas dibe..

Ta ku tu bilindahiya keleha Mêrdînê
Bi dûzbûn û firehiya beriya wê re
Ber hev bikî
Demek dirêj pêwîste
Lê dergeh!
Ew dergehên ku te li pey wan bazdida,
Îro ew dergeh, bi dûv min de dibezin û
Êdî nema wan destên ku
Di xatirxwestina min de bilind bûn
Dibînim.
Belê ez, destê xwe
Ji xatirxwestina hina re bilind dikim..
Da ku nebêjim; ta min xwe naskir,
Temen derbaskir..

- 3 –

Te xwe ji deftera telefona min derxist
Min gazin nekirin,
Bi tenê, min ji pênûsa xwe hêvî kir ku
Nede pey te..
Min ew dergeh girt,

Da ser şopa xwe û li xwe vegeriyam.

- 4 –

Wa weylê!
Çendî ev şivîlek kurtin,
Têra cane min nakin ku
Dûrî te here..

- 5 –

Xwedêyo!
Çendî ew katjimêrên ku
Doh bi min re derbas bûn
Dûrin…
Û çendî yên ku tên nêzîkin…
Dikin ku li dergehê mala min bidin…

- 6 –

(Tiştê çû nede dû)
Bi dawişandinê ez ê tozê bidim alî û
Mêzekim bê çi dibînim…
Da ku ji nû destpê bikim…

Qamişlo, 05/08/2009

# Çar Çirûskên Helbestî

- 1 -

Ji min re gotin:
Ma tu ji berdewamiya qenciyên xwe
Bi xeraban re
Şerm û fedî nakî?!
Min li wan vegerend:
Ez ê çima ji qenciyên xwe şerm û fedî bikim,
Bela ew ji xerabiyên xwe şerim û fedî bikin.

- 2 -

Gelek leheng di vê beriya me a Mêrdînê re
derbas bûne;
Hin bi şûr û mertalên Restemî,
Hin bi tiving û rextan pêçayî
Hin bi kom, koloz û simbêlên badayî..
Tev mirin bûn ax,
Me navên wan jibîr kir..
Bi tenê di xaka vê Beriyê de

Navê evîndariya Derwêşê Evdî ji
Edûla Zor Temir Paşayê Milî re,
Manye zindî.

- 3 -

Qet min nizanîbû ku ew dostê min
Yê ku bi min re xayin ket û
Min deng ji xwe neanî,
Wiha qels û lawaz e..
Ta vê paşiyê min sehkir ku
Eşkere şerê min dike.

- 4 -

Di dilê her mirovekî de
Du gurên har şer dikin;
Yek di ber evîn û xêrê de,
Yek di ber kîn û şer de
Tu li kîjanî ji wan
Bixwedî derkeve,
Ew bi serdikeve.

Qamişlo, Zivistana / 2010

# Çend Xilmaşî!

- 1 –

Welatê min wêran dibe
Welatiyên min di nav berberiya xwebixweyî û
Xilmaşiyê de razayî ne,
Hin bi hin perîşanî û derbiderî zêde dibe..
Dilê min bi ser welat û
Welatiyên min ve ye
Bi hawar, qêrîn û qerebalixê
Ez ê hewil bidim wan şiyar bikim
Bela kes gazinan ji min neke!

- 2 –

Yê zimanê xwe jibîr kiribe
Wek yê ku kilîta mala xwe jibîr kiribe
dergehê mala wî li ber girtiye.

- 3 –

Ku tu kiryarê qenciyê be û
Û xeraban şerê te kirin,
Te jî şerê wan kir
Te çi bi serxist?!

- 4 –

Bazdidim û qamiçiyê rojan
Ji ser pişta min danakeve
Xwe davêjim vî alî, çem dikim wî alî,
Bê fêde ye,
Hay û bayê felekê ji min nîne..
Dema ku diterpilim an dilikumim
Gurên har êrîşî min dikin..
Di vê rev û bezê de
Çîroka jiyana xwe tomar dikim.

- 5 –

Eger berî sed salî
Bajarê Mêrdînê; meskena Meşkînan,
Daşiyan, Sorkan, kîkan, Milan û Xiristiyanan bû,
Beriya wê; warê kar xezalan bû,
Wêranşehir; paytexta Ibrahîm Paşayê Milî bû,
Qesra Hisênê Qenco; keleha xwîniyan bû,
Dêrika Çiyayê Mazî; bihişta Elyas Efendî,
Qedrî Can û Edîp Karahan bû û

Qoserê*; Gundekî kevnar û kavil û wêran bû.
Roja îro, mala stiya (Ozlem Salmiş)** û
Pirtûkxaneya wê a bedew li Qoserê
Qublegeha rewşenbîra ye.
Erê normal e… mane kurdan ji mêj ve gotiye:
Çerxa felekê dizîvire
(Silav li sifra hazire).
* Qoserê: Berê bi van navan dihat naskirin; Denîser, Tilermen, Qoçhisar û niha bi navê Qoserê an Qiziltepe tê naskirin. Gotina Qoserê kurtbûna Qoçhisarê ye.
** Ozlem Salmiş: Rewşenbîreke kurd e, bi koka xwe ji Amedê ye. Ji çar salan ve xwe fêrî zimanê kurdî kiriye û niha mala wê li Qoserê ye, mamostetiyê lê dike. Di ber karê xwe re re jî, di wergera kurdî û tirkî de kar dike. Di mala wê de pirtûkxaneyeke bedew heye û mala wê cihê hevdîtina rewşenbîra ye.

Qamişlo 27/01/2010

# *Mora Nîsanê*

*2 Di 112 Saliya*
*Rojnamegeriya Kurdî de*

(Miletên bindest heyîya xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, qeweta du çekan diparêzin. Ol yek, ziman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek be, hengî çek yek bi tenê ye û bend tenê ziman e…)

**Mîr Celadet Alî Bedirxan**

- 1 -

Nîsan di welatê min de diken e..
Bîranîn xwe li bejin û bala min dipêçe..
Mora xwe li pişta gelek cih, kes û waran
Dixine…û
Çakiya ku bi xerabiyê tê guhertin
Kenê min tîne û min sosretmayî dike…
Mor;

Ne tenê giroverokek bi çend
xêzikan neqişandiye
Mor, mîna heyva nîsanê û
xemilandina şuristê ye
Mor çesipandina dîrok û bûyera ye
Mor roja 22 ê nisanê ye,
Roja ku Mîr Miqdad Bedirxan ji me
re bi nav kiriye û
Bîranînên 112 salan têde, têne
tevdan:
(Gelî mîr û axano, kurmancino!
Qenc bizanin xwendin, ilim û
marîfet
Li dinyê û axretê rûyê mirov sipî
dike..)

- 2 -

Nîsan di welatê min de dibişir e..
Wan  kêlîkên bi henek û laqirdî
Mîna (filaşbakê)
Di ber çavê min re derbas dike
Ew jî mîna morê
Di huş û xeyalê min de hatine
çesipandin
Gelek caran bi min re dijîn
Tevî ku ez hewildidim
Wan jibîr bikim
Lê kelîkên xweş jibîr nabin…

Ew jî mîna van gotinên ku
Ji berî 112 salave hatine gotin:
(Niho zaroyên xwe bielimînin îlim
û maarîfeta.
Hûn bi xulaqeta xwe şûcaa û
cesûrin.
Hekê hûn bibin xweyî îlim, hûnê ji
dinyê hemiya
Xurtir û dewilmendtir bin..)
Ma gelo ev gotin jibîr dibin?!

- 3 -

Nîsan di welatê min de digurnij e..
Buhareke rengîn
Ji dexil, zevî, gul û kulîlkan
dixulxule..
Îro an sibe, kî di firêzeya min de
liqatê bike
Bela bike..bele bike..
Mirovê ehmeq çendî bilive
Bi mora şaşiyan riwê xwe reş
dike..
Mora zanyaran her ala wan bilind
xuya dike..
Ji 75 salan ve Mîr Celadet
Bedirxan gotiye:
(Îro li ser xwendayên kurdan
wezîfeye,

Ferde û ferdeke eyne.
Lê ne kefaye, vekirina
derisxanan..)

- 4 -

Nisan di welatê min de bibaran e..
Cejna rojnaamegeriya kurdî
Bi saya Bedirxaniyan ji heft
rengan e
Mora wan li Kurdistana dayik, Rojî
Kurd, Jîn
Hawar, Ronahî, Roja Nû û Stêr
xweş beyan e..
Qenckiro bi xwe kiro,
Xerabkiro bi xwe kiro.
Gotinek bav û kalan e..
Gelo raste, hin dikin û hin
dixwin..?!
Va îro, em gotinên wan kesên ku
kirine
Bi ava zêr dinivîsin û
Mîna ayetan datînin ber çavan e..
(..li dinyê ji me kêmtir kes
nemaye:
Em miletê kurd bi şûnde mane..
Xelkê hevsarê me kiriye destê
xwe,
Li gor kêf û menfîeta xwe,

Berê me ji bakur dide nîvro,
Ji rojave dide rojhilê..
Divêt em jî bixebitin,
Xelkê xwe hînî xwendin û nivîsandinê bikin
Vî miletê belengaz  ji tariyê xelas bikin,
Berê wî bidin tav û ronahiyê…)
Piştî 112 salan
Ji nû ew dixwin
Hêjî em birçiyê gotinên wan e..
Û em dibêjin; sal bi sal, xwezî bi par..
Ka kovar û rojnameyên bi zimanê kurdî..?!!
An bi tenê nave, ku her rexistinek kovarek wê heye..
Êdî bese, bela Elo ji tûr derkeve.
Devê sikakên qepitandî vebin.
Govenda rojnamegeiya kurdî
Di vê Nisanê de bi şadî li dar be..û
Mora paşketina vê rojnamegeriyê
Di bêrîkên berpirsyaran de nebedî ne mîne.. nebedî ne mîne..
Konê Reş

Qamişlo 17/04/2010

# Heyamo Ji Wan Re Bibêje!

Çi havîneke dirêje
Tu dibêjî qey heyam
 Xwe xuz kiriye û dem
Hûrikên xwe di nav tozê de
Didêre..
Waweylê !
Çilo sal pîr dibin û
Mîrneşîn  pîr nabin ?!

Herdû bestên li dor gundê min
Doda
Gelek çerx û dewran dîtine ta ku
Derbasî dîrokê bûne
Dîroka ku bi bê deng zêrevaniya
Rêwiyan dike û
Hin caran bi wan re
Di kene, hin caran digirî
Lê qet diyalogê bi kesên
rawestyayî re
Li ser peravê demê nake..

Va ez ketime payîza temenê xwe
de

Rojan dispêrim hev û
Bê deng xwe ji wan re xuz dikim
Pêre-pêre sosretmayî dimînim û
 ji xwe dipirsim:
Va ez pîr dibim,
Gelo çima desthilat û
Berpirsyar pîr nabin ?!

Derewan  dikin û
Tu bi wan zanî
Pêre jî ev gotin tê hizra mirov:
(Xwe bi parêze ji şerê wan kesên
ku
te qencî bi wan kiriye)
An:(ku te qencî bi merdan re kir
Te ew ji xwe re kirîn û
Te qencî bi nemerdan re kir
wê rojekê li ber te rabin û
Berberiya te bikin)

Dibêjin:
Ji bo rastî bê gotin,
Dîrok xwe vedigerîne
Gelo  ! Ji bo vejandinê
Evîn jî xwe vedigerîne
Heyamo ! ji wan re bibêje!

Qamişlo, Tebaxa 2004

# Belê Mamoste!

**(Ji Yadvegera 85 Saliya Şehîdbûna Şêx Seîd Û Hevalên Wî Re)**

Belê mamoste..!
Em çûn Wan û Miksê û zîvirîn..
Me qurtek ji (Ava) Feqîyê Teyran vexwar..
Tu dibêjî, qey tiştek nayê guhertin;
Ne piştî hezar kul û derdî û
Ne sibe û dusibe..
Ne berî nûçeyên sibehî û ne piştî nûçeyên êvarî û
Ne piştî hezar rondkê kevokên ji wêraniyê revyayî..!
Tu dibêjî, qey tiştek nehatiye guhertin;
Ne berî hezar rêkên agirî,
Ne piştî hezar helbestên qetometo û
Di kolanan de avêtî..
Tu dibêjî, qey esman bi darê
Beriwên piroz
Hatiye reşandin û
Ewir, cangoriyên taze belav dike..

Û ev kelek..
Ey Xwedan..!
Ev keleka ku bi termê dîroka zilm û
Zorê hatiye dagirtin, berê wê li kû ye?!
Tu dibêjî, qey me war derbas nekirine û
Dîrok di warên me re derbas nebûye..?!
Em kîne?!
Em kîne Rustemê Zal?
Em kîne Edrîs û Şerefxanê Bedlîsî?
Em kîne Mem û Zîn, Ferhad û Şêrîn?
*        *        *
Gelî ûcaxên Xwedê!
Qey keleka me di orta deryayê de winda bûye?
Pêlek wê dispêre pêlekê?!
Şev li me gerya ye..?!
Dara mirovahiyê şewitîye?!
Ta ku sikak û kolan bi zilm û zorê di warên me re
Derbas dibin;
Bêyî ku guh li me bikin,
Bêyî ku tiştek bê guhertin.. û

Em çîrokên axîn û hisretan
bidarvedikin?!!
Gelo wê êşa me ta dawiya
elfabeyê dirêj bike..?!
*        *        *
Mamoste!
Gotin di dawiya şevê de digrîn..!
Bêdengiya me bi çûkên mirî yên vî
heyamî re
Dilewite..!
Ev heyamê ku em ji bo wî distirên
û
Ew, serê xwe ji bo me dihejîne..
Digirî û di ber xwe de dibêje
pepûk..
Waweylê…
Em ê çawa wêneyê bav û kalên
xwe
Winda bikin,
Kum û kolosê wan li ber ba
bifelişînin?!!
Çendî dayikên me gazinan bikin,
çendî mîr Bedirxan,
Şêx Nehrî, Şêx Seîd ji me bi lome
bin;
Em, di çayxaneyên bîranînan de
Qerebalixê dikin,

Bi dirêjbûn li ber dergehên
bajarên giryayî
Radiwestin,
Lêborîn û pexşanê dixwazin û
Ji darên xûz û tewyayî dipirsin;
Gelo, em bi derengî ketine?!
Tu dibêjî, qey em bi derengî
ketine..
Tu çi dixwazî mamoste Derwêş!
Em çi dixwazin;
Penaberiyê em di nav baskên xwe
de
Hilanîne..
Rêkên çûn û nehatinê ji çûna me
Westiyane.
Wî li wî yê ku karibe bireve û
kî berê kerwan didî kû, bela ew
be..!!!
Em bi bêdengî û şerê xwebixweyî
Di berxwedanê de ne..!!!
Bi zimanê biyaniyan dinivîsînin û
şerê hev dikin..!
Çi şevek dirêj e, gelo dawî jêre nîn
e?!
Kolanên rojhilata navîn ji hejariya
zarokên me
Têr xwarin..!
Werin, em bi pêş de herin da ku

Nifşên li paş me bi pêş ve bilivin.
Ax, çendî ev heyam bi kul û derd e..
Bila em ardiwê ronahiyê bin
Ne ardiwê tirava temirandî bin.
Kelek di orta deryayê de westyayî ye..
Li hêviya we ye.

Qamişlo, 01/07/2010

# KURTIYEK JI JIYAN Û KARÊN KONÊ REŞ

**Konê Reş** di sala 1953 an de li gundekî ji gundên pir belav di navbera tixûbên Binxetê û Kurdistana Bakûr de, bi navê Doda de hatiye ser rûyê dinyê. Navê wî yê rasteqîn **Selmanê O. Abdo** ye. Lê ew di berhemên xwe de piranî navê Konê Reş bi kar tîne. Ango gundê wî di navbera Qamişlo û Amûdê de ye.

Ji malbateke Kurdperwer, zimanhez û rewşenbîr e. Ciyê lê hatî dinê xwendina xwe ya seretayî tewaw kir, şunda li Qamişlo û Hesekê lîse "bakaloriya" standiye û gelek hewl dane xwe da ku xwendina xwe bi dawî bîne, lê pê re neçûye serî, ta ku di Elmanya ve derketiye.

Ji mêj ve bi dûv ziman, folklor û toreya gelê xwe de ye. Di gelek kovar, rojaname û belavokên Kurdî de beşdariya wî heye.Ta niha di çil û sê kovar û rojnameyên Kurdistanî de, li her çar parçeyên Kurdistanê û li derveyî welat berhemên wî hatine weşandin û belav kirine.

Ji kesên pêşîne di Binxetê de ku bi zimanê Kurdî nivîsandiye, piştî Osman Sebrî, Cegerxwîn, Qedrî Can, Tîrêj, Keleş û Rezoyê Osê...

Ew hêjî bi kar û barên xwe berdewame li ser nivîsandina bi zimanê Kurdî.

Ew xwediyê kovara “Gurzek Gul” bû, di gel hevalê xwe A. Baqî Huseynî, ta bi hejmara 10 an, paşê wî bi tena xwe berpirsyariya kovarê kir, ta ku hejmarên wê gîhan 15 an. Ew kovara ku di navbera salên 1989 û 1992 an de, li Qamişlo, li nav Kurdên Binxetê dihat belav kirin.

Konê Reş gelek xelat standine. Ji wan xelatan:Xelata zêrîn ji Hikumeta Herêma kurdistanê, di sala 1998 an de, bi helkeftina sedsaliya rojnamegeriya Kurdî û di sala 2000 î de jî, hatiye xelat kirin ji rex birêz Felekkedîn Kakayî ve, wezîrê rewşenbîriyê di hikumeta herêma kurdistanê de, bi helkeftina festîvala Cizîrî li Duhokê.

Di sala 2003 an de Konê Reş beşdarî di sedsaliya Cegerxwîn de kiriye li Amedê.

Hem jî endame di PEN a Kurdî de li Elmaniya, ya ku şaxeke ji PEN a Navnetewî.

Di meha tebaxa 2006 de, bûye yek ji helbestvanên cîhanî (**Poetas del Mundo**) û jêre rûpelek hatiye vekirin di nav her 8 helbetvanên Kurdistanê de..Hêjaye gotinêye, ev yekemîn care ku navê Kurdistanê di cihekî cihanî de bi helbestvanên xwe, di nav dewletan de bilind dibe.. www.poetasdelmundo.com

Hêvî û daxwazên Konê Reş evin; ku wê rojê bibîne, ew roja ku her sibeh rojnameyeke Kurdî bi tîpên Latînî li ber deriyê mala xwe bibîne û bi rêka wê rojnameyê nûçe û bûyerên Kurdistanî û cîhanî bixwîne û seh bike.

Berhemên Konê Reş yên çapbûyî

**Di warê vekolîn û lêgerînên dîrokî de:**

- Serpêhatiyên Mîran(1) Beyrût 1991
- Mîr Celadet Bedir-Xan, bi Erebî, Şam 1992, bi Kurdî Stokholm, 1997
- Serhildana Sasonê, 1925-1936, Şam 1995
- Osman Sebrî, 1905-1993, Şam, 1997
- Komela Xoybûn û Bûyerên Rojane yên Şoreşa Araratê, Erbîl, 2000
- Pirtûka Qamişlo, Lêkolîn bi Eerebî, Stenbol: 2003, Heleb: 2004 û Silêmaniyê, Kurdistana başûr: 2006

**Di warê helbestên mezinan de:**

- Welato !, Helbest, Beyrût, 1998
- Dergehê Jîn û Evînê, Helbest, Beyrûrt, 2001
- Cûdî Çiyayê Miradan, Helbest, wergerandina Hejar Îbrahîm, Şam, 2004
- Dara Çinarê, Helbest, wergerandina Îmad Elhesen, Şam 2006

**Di warê helbestên Zarokan de:**

- Sîpan û Jîn, I. Beyrût, 1993

- Şagirtê Bedir-Xan im, helbestên zarokan: II. Beyrût, 1996.

Ew di meha Avrîlê sala 2006 an de, di festîvala Bedîrxan ya sisyan de li Hewlêra paytexta Dewleta Kurdan, beşdar bû û xelata festîvalê stand. Wî di sala 2004 an de jî, xelata Festîvala Bedirxan ya yekemîn standî bû. Ew festîvala yekemîn li bajarê Silêmaniyê hatibû li dar xistin... Her wiha Konê Reş di şibata 2008 an de yek ji semînerbêjên festîvala yekemîn a Seydayê Cegerxwîn bû, ewa ku li Hewlêra paytex hat li darxistin û bo mijara xwe xelat stand..

Her wuha ew xwediyê gelek berhem û gotaran e, ku ewna di kovar û rojnameyên Kurdî yên rojane de tên weşandin. Konê Reş bavê pênc zarokan e; Sîpan, Jîn, Nalîn, Befrîn û Celadet.

Ew li bajarê Qamişlo bi malbeta xwe va dijît.

Ew wiha xwe dide naskirin:

## Mirovekî Kurd im

Ji sala 1514 an ve
Ta roja îro;
Di kul, êş û janên
Gelê xwe de  di ponjim
Xemxur û zikêşê
Zimanê dê û bavê xwe me;

Yekim, ji wan kesên ku,
Li dor malbata Bedir – Xaniyan
Di xepêrim...
Ez Konê Reş im.
Konê ku stûnên wî,
Bi kuçên ji çiyayê
Sîpanê Xelatê, Barzan û Agrî
Bilind dibe,
Çît û berçîtên wî
Bi zil û qamîşa
Derdora çemê Dicle û Ferat
Dibe dîwar û
Bi hevirmêşa
Mûş û Bazîdê
Hatiye hûnandin..
Ben û şerîtên wî
Ji hiriya berxên
Şikak û Heyderan,
Keriyên koçerên Milan û Mîran
Hatiye ristin...
Konê ku  ji mûyê
Bizinên zozanê Botan,
Zozanê şerfdînê û çiyayê Mazî
Hatiye çêkirin  û
Bi rengê şevê
Hatiye debixdan
Da ku di rojê de
Belû û diyar be û

Xweş bê xuyakirin;
Dinya û alem tev
Bibîne û bizanibe ku
Qet singên konê min
Ji nav xaka bav û kalan
Nayên hilkirin
Nayên hilkirin

**Ez Konê Reş im**

Mirovekî Kurd im.

---

# Naverok

- Ez delaliyên xwe li kê bikim ?! ........................ 7
- Şivanimn.................................................... 11
- Ew û Doda û bîranîn .................................... 14
- Normale ..................................................... 17
- De werin .................................................... 23
- Jiyan rewrewka derewîne .......................... 26
- Çend wêne ................................................. 28
- Normalî û ne normalî ................................. 30
- Te divê biwînî an ne xwînî .......................... 32
- Gula Hîroyê ............................................... 34
- Giriyê du reng ........................................... 36
- Dara Beriwê .............................................. 41
- Dîmenekî spehî .......................................... 43
- Dema ........................................................ 45
- Çend kurtepistên Haykoyî ......................... 46
- Zor-Zore ................................................... 48
- Bendewarî ................................................. 50
- Sermelekê Pêşmergeyan ........................... 52
- Jiyan bê bext û ewleye .............................. 60
- Bifire –bifire .............................................. 63
- Dêmê min tabloyeke ji kul û xeman .......... 65
- Welatiyê min ............................................. 68
- Dotmamê (1) ........................................... 70
- Dotmamê (2) ........................................... 72
- Kanûnê ..................................................... 74
- Tebaxê ..................................................... 76
- Dara Çinarê .............................................. 80
- Evîndarê Zimanê Dê û Bavê xwe me ........ 82
- Di Dadgeha Yezdanî de ............................. 87
- Hevalê ! .................................................... 89
- Rengê Spî ................................................. 90
- Mirovantî ................................................. 91
- Zeriya min ! Dema Dengê te Seh dikim...... 92
- Zeriya min ! Dema tu tê bîra min .............. 94
- Zeriya min ! Min her tişt spartiye qederê .. 96
- Zeriya min ! Dema xatir ji te dixwazim.. .... 98
- Zeriya Min ! Dema Sira Bayê Xerbî Radibe.. 101
- Zeriya Min ! Minê bêtir hez te kiriba.. ......... 105
- Zeriya min ! Bela wiha be..?! .................... 110
- Zeriya min !…............................................ 113
- Rinda Min ! ............................................ 117

- BELA KÊFA WÊ BÊ ...................................... 122
- Tikaye nekin seravde ji min re! ................. 125
- Jiyan Bendewarî ye .................................. 128
- Dil birîndarê te ye .................................... 131
- Xulamên xulamokan e .............................. 134
- Bela bimire..?! .......................................... 137
- Doda, Barzanî û Ala welatê min .............. 140
- Zêrevano ! ................................................ 141
- KURTEPISTEK DI GUHÊ TE DE .................... 145
- Dem Wek Şivîlekê Derbas Dibe* ............... 147
- Çar Çirûskên Helbestî .............................. 150
- Çend Xilmaşî! ........................................... 152
- Mora Nîsanê .............................................. 155
- Heyamo ji wan re bibêje!............................. 160
- Belê Mamoste! ............................................................... 162
- KURTIYEK JI JIYAN Û KARÊ  KONÊ REŞ ....... 167

# Ji weşanê n

# Êketîya nivîserên kurd
# Tayê Duhokî

1) nivê jek mestan e li dor gunbeda cizîrî / vekolîn, di. Fazil Umer ٢٠٠٤ –
2) xewnê n tazî /helbest, ruxuşê zîvar ٢٠٠٤ –
3) wexerek di nihê nîyón deqî da/ rexne û vekolîn, yasirê Hesenî ٢٠٠٤ –
4) bîyavê xwandinê /vekolîn, Celal Mistefa ٢٠٠٤ –
5) liber derazînka tê kstan/ xwandinê n wê jeyî ,selam balayî ٢٠٠٤ –
6) xwandingeha birisîkirinê /çîrok, êdîq hamid ٢٠٠٤ –
7) hizir û dîtin/ hizir û rewşenbîrîya giştî ,di. Arif hîtu ٢٠٠٤ –
8)çend rê yek bo deqî /vekolîn, êbîh mihmid hisin ٢٠٠٤ –
9)berperekê winda ji jîyannama Selîmê esmerê /çîrok, anur mihmid gahir ٢٠٠٤ -
10)çend xwandinek şê wekarî /vekolîn, star lî ٢٠٠٥ –
11)janê n sînahîê /roman, tihsîn navişkî – ٢٠٠٥
12)qises min bilad alnircis, hisin silîvanî )algbe alpanî ye) ٢٠٠٥ –
13)gotarê n rexneyî /komele witar, hoşeng şê x mihmid ٢٠٠٥ –
14)gerîyanek di nav baxê edebê kurdî da, Reşîd findî ٢٠٠٥ –
15)sotingeh/ roman, bilind mihmid ٢٠٠٥ –

16)sîyapoşê zê marî /çîrok, di. Fazil mir – ٢٠٠٥

17)şanoya hevçerx û çend dîtin/ sîyar timir – ٢٠٠٥

18)vîyan di demekê jandar da/ roman, mihsin bidalirihmin ٢٠٠٥ –

19)teknîka vegê ranê di kurteçîrokê n (fazil Umerî) da/ vekolîn, nefîsa Îsmayil ٢٠٠٥ –

20)mê rî û kevok/ çîrokê n zarokan, di. Bidî hacî ٢٠٠٥ –

21)hejde çîvanokê n gurga/ çîrok, bi: Mihmid bidalle (çapa dûê ) ٢٠٠٥ –

22)rustemê zalê /di. Arif hîtu (çapa dûê ) – ٢٠٠٥

23)şihîna çîyayê spî /çîrok, nizar mihmid sîd ٢٠٠٥ –

24)cemiserê sîê /kurte çîrok, Xalid êalih – ٢٠٠٥

25)eî roj neçe ava/ pexşan, selam balayî – ٢٠٠٥

26)ji rewşenbîrîya kurdî /vekolîn - gotar, nacî gih berwarî ٢٠٠٥ -

27)zarokê n cîhana aştî û aşopê /vekolîn, hizirivan bidallih ٢٠٠٥ -

٢٨)Dihok di serborؘan da/ bîrewerî ,êdîq hamid ٢٠٠٥ -

٢٩) cak dirê da û helweşandin/ vekolîn, di. Fazil mir ٢٠٠٥ -

30)dawiya ş–erؘvanekî /roman, êmt mihmid bidil ٢٠٠٥ -

31)pê lê n rexneyî /rexne, nimt allih hamid nihê lî ٢٠٠٥ -

32)dema hê şta gîyanewer dişîyan baxivn/ çîvanokê n millî ,û: Hicî cifir ٢٠٠٥ -

33)ber bi deqê xomalî /deq û şirovekirin, Îbrahîm Ehmed simo, 2005
34)mê mê tîkis, ji hizirikirinê taku aydyolocîyayê /di. Fazil mir, 2005
35)kelitor.. Nas—yonalîzim û erebk–rin/ vekolîn, ebdal nurî ٢٠٠٥ ,
36)peyvê n bê perde/ vekolînê n rexna edebî ,bidalixaliq sultan, 2005
37)nivîstin di çavê n nê rgzê da/ helbest, beşîr mizwîrî ٢٠٠٥ ,
38)ji felsefa berxudanê /helbest, remezan îsa, 2005
39)ewê dijî hemîya/ kurteçîrok, êbîh mihmid hisin, 2005
٤٠)nijîyargerî /di. Fazil mir, 2005
41)bîst sal û ê varek/ roman, êbirî silê vaneî , ٢٠٠٥
42) nivê sîn di navbera nivîserê n xudawend û lê ger̜yan li azadîê /vekolîn, hoşeng şê x mihmid, 2005
43)ji çîrokê n millî yê n filklorî /cimîl mihmid şê lazî ٢٠٠٥ ,
44)ciwahir Alimbdîn/ minaqşat adbî ye, asmayil badî ٢٠٠٥ ,
45)dîmenê n peçnî /çîrok, kîvî Arif, 2005
46)tîr ji kivana diweşîyön û ber tê ne min/ helbest, selman kovlî ٢٠٠٥ ,
٤٧)kevalekê rwîs/ helbest, şukirî şehbaz, 2005
48)dewlet û şiqeka kevnar /helbest, deyka dalîyayê ٢٠٠٥ ,
49)şevê n bê xew/ helbest, beyar bavî , ٢٠٠٥
50) azirandina bendemanê /hizirivan, 2005

51)çaxê roj dipeyvît/ helbest, şemal akireyî, ٢٠٠٥

٥٢)dû çemkê n havîbûn yaxîbûn/ emîn bidaliqadir, 2005

53) rastî û talan, êbhî Mirad, 2005

54)deftera bê gunehîê /helbest, bidalirihmin bamerinî ٢٠٠٥ ,

55)ziman û zimanivanî /bidaluhab Xalid, 2005

٥٦)evîn, xem û mirin/ helbest, gîb deştanî, ٢٠٠٥

57)zîndana biçwîk/ helbest, zîz xemcivîn, 2005

58)şiq di behşteka yutubîyayî da/ helbest, mêgfî silîm, 2005

59)ezê di hembê za henasê n te da/ çîrok, asmayil mêgfî ٢٠٠٦ ,

60)roman li devera behdînan/ vekolîn, remezan hecî ٢٠٠٦ ,

٦١)raya giştî ,tê geh û pê nasîn û guhorîn û pîvana zanistî /vekolîn, mislim batê lî, ٢٠٠٦

٦٢)helbes—tê n reng—yn/ hozan, û: Tengezarê marînî ٢٠٠٦ ,

63)tevnikera k—wrd, hunermenda berze/ vekolî–n, û: Mesud Xalid gulî ٢٠٠٦ ,

64)çapemenîy—t rewş—enbîrê t dev—era behdîn—an (1935 -2000) / bî–blugrafîya, wêfî hisin ridê nî ٢٠٠٦ ,

65)şeva firîşte revîn/ çîrok, asmayil silîman hacanî ٢٠٠٦ ,

66)gululka alozîyaî /Xalid êalih, 2006

67)nivê jeka baranê /hozan, heval findî, ٢٠٠٦

68)roj/ hozan, hişîyar rê kanî ٢٠٠٦ ,
69)şiq li jê r pira çînudê /bilind mihmid, 2006
70)werzê evînê /novlê t, yunis ahmid, 2006
٧١)efsaneya stiranê n bindesitîê /nicîb balayî ٢٠٠٦ ,
٧٢) xewneka emirîkî ,çîrokê n zîz nisîn/ û: Xîrî buzanî ٢٠٠٦ ,
٧٣) hizirînek di zimanê kurdî da/ rişîd findî , ٢٠٠٦
٧٤) xanî Mamostayê sê yemîn/ mem şeref, 2006
٧٥) ji awazê n ciwanîê /hozanê n, nacî gih berwarî ٢٠٠٦ ,
٧٦) pê daçûnek liser hindek belgenameyê n taybet bi kurdanive/ vekolîn, di. Êlah hirurî ٢٠٠٦ ,
٧٧)meşa bokan/ hozan, hîvî berwarî ٢٠٠٦ ,
٧٨)ew zelamê digel xo lê k cuda/ şano, sîyar temer, 2006
٧٩) pelê n şiqê /hozan, diribas Mistefa, 2006
٨٠) şevê n sar/ roman, Hesen Îbrahîm, 2006
٨١)hozan bo delalê /hozan, Xalid hisîn, 2006
٨٢balolka şekirê /çîrok, hisin silê vanî ٢٠٠٦ ,
٨٣heyranok nameyê n evîndaran/ edîb bidallih, 2006
٨٤mirin di qişleya padşahî da/ çîrok, mihsin bidalirihmin, 2006
٨٥çîvanoka gayê sor/ filklur, cimîl mihmid şê lazî ٢٠٠٦ ,
٨٦selwa hê ş belalîske/ helbest, liqman ashî , ٢٠٠٦
٨٧bilîcan/ roman, perwîz cîhanî ٢٠٠٦ ,

٨٨) leilîxana goveyî /çîrok, mêgfî bamerinî, ٢٠٠٦
٨٩) veger̥/ roman, şahîn bekir sureklî ٢٠٠٦ ,
٩٠) qedera min/ hozan, selman şê x memî, ٢٠٠٦
٩١) bê hnşk/ fulklor, mihmid hisin binavî, ٢٠٠٦
٩٢) armanc/ hozan, Sebrî ye hekarî ٢٠٠٦ ,
٩٣) bakurê dil/ hozan, dilşa Yusif, 2006
٩٤) xewnek binefişî /çîrok, êmt mihmid bidil, 2006
٩٥) nihê nîyón xameî /hozan, sebirî nihê lî, ٢٠٠٦
٩٦) henasek di perstgeha şirê da/ xwandinê n wê jeyî ,selam balayî ٢٠٠٦ ,
٩٧) şorşê n Barzan/ hozan, heyder metînî, ٢٠٠٦
٩٨) eşqa me çirayekê zeradeştî ye/ kurteçîrok, simayil Mistefa, 2006
٩٩) tenhstan/ helbest, Kemal silê vaneî ٢٠٠٦ ,
١٠٠) Rostemê zal/ fulklor, cemîlê hacî ٢٠٠٦ ,
١٠١) miqalat niqdîye/ micmwe alktab, 2006
١٠٢) bergotîyyón Koçerekî deştînebûyî / hozan, asmayil taha şahîn, 2006
١٠٣) dev çi nabihîsin! / kurteçîrok, tê lî Salih musa, 2006
١٠٤) şeveka bê nivê j/ hozan, layiq cemal kurê meî ٢٠٠٦ ,
١٠٥) paraduksîzim û tê gehê wê di hozana nwîxwaza kurdî da li devera behdînan/ vekolîn, simet xabûr, 2006
١٠٦) dosîya Barzanî di sindoqa pîlayî ya stalînî da/ vekolîn, wezîrê Eşo, 2006
Helebçe/ helbest, seydayê Keleş, 2007

Çavê n sîtavkê /roman, tehsîn navişkî ٢٠٠٧ ,
Bakurê helbestê /helbest, arjen arî ٢٠٠٧ ,
Gerِyaneka bê hode/ çîrok, nefîsa Îsmayil, 2007
Sure birîna şeva min/ helbest, selwa gulî , ٢٠٠٧
Eşiq di xilwegeha mirinê da/ helbest, aştî germavî ٢٠٠٧ ,
Sirudê n rojihelatî /çîrok, Celal Mistefa, 2007
Arîyana sînurê n dûr/ helbest, Mesud xelef, 2007
١١٥) awazê n xameyî /lê kolîn, nimt allih hamid nihê lî ٢٠٠٧ ,
١١٦) beyta sîsebanê /hizirivan, 200 ٧
١١٧) vekolana zimanî /vekolîn, di. Fazil Umer, 2007
١١٨) leşê şevê /helbest, selam balaٌyî ٢٠٠٧ ,
١١٩) dalehî yê n kesekê bi tinê /çîrok, di. Arif hîtu, 2007
١٢٠) çend hizirê n rewşenbîrî /gotar, nacî taha berwarî ٢٠٠٨ ,
١٢١) helkulîna zimanî /vekolîn, di. Fazil mir, 2008
١٢٢) xewneka kîvî /helbest, deyka dalîyayê , ٢٠٠٨
١٢٣) jibo rê nivîseka çê tir, Îsmayil taha şahîn, 2008
١٢٤) petiromekirina gunehan/ çîrok, mihsin bidalirihmin, 2008
١٢٥) rojanê n şê tekî /tê ksitê n edebî ,adîb bidallih, 2 ٠٠٨
١٢٦) roj ava dibît da bihelê t/ helbest, êdîq Xalid hirorî ٢٠٠٨ ,

١٢٧) bajê rê dîna û çend çîrokê n din/ karîkatore çîrok, tê lî êalih, 2008
١٢٨) evîn û stiran/ hozan, fyêl mêgfî ٢٠٠٨ ,
١٢٩) govenda jînê /hozan, di. Xîrî nimu şê xanî ٢٠٠٨ ,
١٣٠) kepezê xewnan/ helbest, xemgînê remo, 2008
١٣١) bender/ helbest, dîya ciwan, 2008
١٣٢) spîhstan/ kurte çîrok, Xalid êalih, 2008
١٣٣) hê çbûn/ Ehmed yasîn, tê ksitê n edebî ٢٠٠٨ ,
١٣٤) tê kst di navbera gotara rexneyî û rê ybazê n edebî da, emîn bidaliqadir, 2008
١٣٥) payîzeka şîn/ helbest, tirîfe doskî ٢٠٠٨ ,
١٣٦) dê çawan pertukan çê keyn/ vekulîn, huşeng şê x Mihemed, 2008.
١٣٧) şevê n birag/ roman, Hesen Îbrahîm, 2008.
١٣٨) beyond tihe red mountinis li pişt çîyayî sur/çîrok, liqman asîhî ,wergê ran ji kurdî bo niglîzî. ٢٠٠٨ ,
١٣٩) deh xewn/ helbest, kumeka helbestvanan, 2008.
١٤٠) rapirsîn û rawergirtin/ vekulîn, mislim batê lî. ٢٠٠٨ ,
١٤١) varê / tê ksitê n edebî ,Xalid hisê n, 2008.
١٤٢) pira arta yan bihayê giran/ sê şanugerîyön wergê ray, enwer Mihemed tahir, 2008.
١٤٣) tirsa bê didan/ roman, helîm Yusif, 2008.

١٤٤) bîranînê n serxweş/ helbest, sîrwan qiçu, 2008.
١٤٥) payiza peyvan/ xwandinê n hizirî û rexneyî ,sebirî silê vaneî. ٢٠٠٨ ,
١٤٦) meydana kûwçkan/ Îsmayil silê man hacanî ,kurte çîrok, 2008.
١٤٧) çend sitê rê n geş di helbaste nû ya kurdî de (kirmancîya jê rî) /xelîl Dihokî , vekowlîn, 2008.
١٤٨) dîwanê n Botanî/ sebirî Botanî ,helbest, 2008.
١٤٩) ziman û edeb û mê jûya kurd di (rojî kurd) da 1913/hcî cifir, vegolîn, 20. ٠٨
١٥٠) lavja kevnewarekê xembar/gulnar elî , helbest, 2008.
١٥١) sinurê n vekirî /Îsmayil badî ,çavpê keftin, 2008
١٥٢) pesnê n amedxanê /henîf Yusif, helbest, 2008
١٥٣) tiwafa yarê /emerê leilê ,helbest, 2008
١٥٤) tyora wê jeyî /û: Di. Arif hîtu, vekolîn, 2008
١٥٥) saloxet di heyranokan da/ Cemîl Mihemed şê lazî ,vekolîn, 2008
١٥٦) şano... / sîyar temer, vekolîn, 2008
١٥٧) min nevê t ji leşê te bibarm/ beyar zawîteî ,hozan, 2008
١٥٨) sê hirebendî ya berdewam (zimanê çameyî) /fazil emer ,vekolîn, 2008
١٥٩) sakw/ nuzad mizurî ,kurteçîrok, 2008
١٦٠) ferhenga klasîkê n kurd/ Mesud Xalid gulî ,vekolîn, 2009

١٦١) ew pîyaweî be lamewe r̤t bû/ behr muftî ٢٠٠٩ ,
١٦٢) çend babet û lê kolînê n zimanî / bidaluhab Xalid, vekolîn, 2009
١٦٣) sîmîya ؛alxgab alşirî ٢٠٠٩ ,
١٦٤) rojanê n edebîyata kurdî–Çîkî ٢٠٠٩ ,
١٦٥) li bersifka me befir barî /mihsin quçan, hozan, 2009
١٦٦) deng û hellnigftin/ azad daritaş, xwîndinê n rexneyî ٢٠٠٩ ,
١٦٧) alşwaf... Walîle alaxîre/ û: Samî alhac, çîrok, 2009
١٦٨) kîmîyager/ û: Di. Lezgînê avdirehmanî , roman, 2009
١٦٩) ew pîyawaneî le naw r̤engî tablokanim sema deken/ nalle Ebdulir̤ehman, çîrokan, 2009
١٠٠ (١٧٠salîya zana û nivîserê kurd qanatê Kurdo/ tusnê Reşîd, komeleka vekolînan, 2009
١٧١) helweseyê n zînê /di. Arif hîto, helbest, 2009
١٧٢) baxure/ mihsin bidalirihmin, roman, 2009
١٧٣) pê la reş/ hişîyar rê kanî ,ji bîrewerîyón pê şmergeyekî ٢٠٠٩ ,
١٧٤) kimê dê gewir/ êdîq hamid, roman, 2009
١٧٥) demê nîçe bi xo dibê jît/ û: Sallih Yusif sofî ,vekolîn, 2009
١٧٦) babê mino/ mihmid silîm sîyarî ,çîrok, 2010
١٧٧) miqhî Alimîyan/ anur mihmid gahir, qêê kurdî ye mitrcme, 2009

١٧٨) ew xanima henê /Hesen silê vaneî, helbest, 2010
١٧٩) sewdaserî /Xalid sindurî ,helbest, 2010.
١٨٠) henaseyê n şirî/ bidalirihmin bamerinî, helbest, 2010.
١٨١) şev jî di axivn/ demhat dê rikî ,helbest, 2010.
١٨٢) f—rِyin di pencerê da/ hizirivan, helbest, 2010.
١٨٣) stafkê n evro û duhî /şemal akireyî, helbest, 2010.
١٨٤) ez û tu bi dîtineka dî /nacî taha berwarî ,helbest, 2010.
١٨٥) ne heval ne..! / Ehmedê şoşî ,helbest, 2010.
١٨٦) çend gulek bo yara min/ selman şê x memî ,helbest, 2010.
١٨٧) dara çil awaz/ edîb çelkî ,helbest, 2010 .
١٨٨) bîlge sûmer/ peyaleke din tarî ,helbest, 2010.
١٨٩) wexerek li nav pê rِebesitê n zimanê kurdî) kirmancî) /façil mir, zimannasî, ٢٠١٠.
١٩٠) seyê hê ja/ ezîz nesîn, wergê ran: Ehmedê zero, (çîrok), 2010.
١٩١) hikîm bidallh/ meydan, çîrok/ 2010.
١٩٢) miqalat linxbe min alnqad/ dirasat niqdî ye n aladib alkurdî, 2010.
١٩٣) lê kulînê n kurdî /lê kulîn, 2010.
١٩٤) xewnê n helawîstî /selwa gulî ,hozan, 2010.
١٩٥) layê dî yê pirê /tehsîn navişkî ,roman, 2010

١٩٦) bê dera rwîs/ behrî Reşîd, hozan, 2010.
١٩٧) bîblugrafîya çîrukê n devera behdînan/ Xalid Salih, bîblugrafîya, 2010 .
١٩٨) dim alênubir/ qêad kurdî ye mitrcme, alşair: Bidirxan alsndî ,tircme bidil rivu Alimzurî, şir, 2010
١٩٩) Şîhîna Şevbuhêrkên Dîl/ Konê Reş, hozan, 2010